

Pênûs

Kovareke rewşenbîrî giştî ye

Her sê mehan carekê der dikave

sal. 8 Hejmar. 20 Buhar. 2006

Sernivîser:

Dr. Ebdilmecît Şêxo

mecidshexo@hotmail.com

Design û berg:

Reşad Yûsiv

Desteya nivîseran:

Keça kurd

H.Gundî

Elî Cafer

Cim'a al-Dawod

Tabloya bergê:

Nihad Gulê

Çapxane:

BABOL Druck-Kölen

Her nivîskarek di ber berhema xwe de ; di ber nêrîn , dîtîn û helwesta xwe de bepirsyar e. “Pênûs” wî mafî dide xwe ku hemû nivîsarên ku jê re tèn, li gor rêziman û rastnivîsandina mirê Kurmanciya nûjen **Celadet Bedir-Xan**, serast bike. *Pênûs*

Navnîşan û Email:

www.efrin.net/penus

kovarapenus@hotmail.com

Ji weşanên:

**Partiya Yekîti a Demokrat a Kurd li Sûriyê -
(YEKÎTÎ) Rêxistina Ewropa**



Pênûs sal. 8 Hejmar. 20 Buhar. 2006

Naverok

Sergotar

Dr. Ebdilmeçit Şêxo.....3

Şayirê xerîbiyê Fêrikê Ûsiv

Wezîrê Eşo.....7

Çend têbîn û gotareke C.Bedirxan

Şahîne B. Soreklî.....20

Çend egerên bo me pêwîst

Norî Birîmo.....25

Beyta Şêx Behadîn

Celîlê Celîl.....27

Têliya Qîza Mîrza Axa

Salihê Kevirbirî.....36

Hevpeyvîn:

Serokê Enstîtuya Zimanê kurdî

Nûnerê Pênûsê.....43

Rostem II

Socin Prym/Cankurd.....49

Lêker di zimanê kurdî de

Dr. Hussein Habasch.....57

Li tenişt dîwarê goristanê

Keça Kurd.....69

Bêdengiya qizêzê

Nezîr Palo.....73

Ez bişewitim jî.....

Hêmin Kurdaxî.....75

Beşê Erebi.....81

Sergotar



Dr. Ebdilmecit Şexo

Kurdistan avdarî ye

« Bê êş bûyereke kêrhatî û mezin çênabe »

Hîgil

Di dîroka Kurdistanê de weha lê hatî ye,ku Avdar ji bo gelê Kurd meheyeke zor taybetî ye,Avdar di nav xwe de rojên bextewarî,hêviyên geş diyarî Kurdistanê kirine, lê Avdarê, bêtarî û bêzariyên gewre jî bi ser Kurdistanê ve anîne.

Kawayê hesinkar beriya 2618 an,di 21 Avdarê de, yekemîn diyarî ji gelê Kurd re bû,ewî dawiya nijadperestiya Dehakê xûnmij anî û gelê Kurd ji windabûnê rizgar kir .

Eger em yekser werin destpêka sedsalên bîstan ,dîsan Avdarê di sala 1903 an,roja14 an de Mistefa Berzanî pêşkêşî gelê Kurd kiriye,ewî bi raperîn û şoreşên kurdî dîroka Kurdistanê xemiland. îro Kurd li başurî Kurdistanê li ser hêman û rêbaza nemir M.Berzanî serkewtinên payebilind bi dest xistine ,û gelê me xwe li her sê beşên mayin jî bi van encamên mêjoyî serbilind dibîne, lewra jî nemir M.Berzanî bû ye nasnama netewa Kurd.

Herweha ji sala 1910 an de para jinên Kurdan di 8 Avdarê,roja çejina jinên cîhanê de heye,ev roja ji bo dîroka bizava jinên Kurdistanê jî mîna roja xwenasîn û têkoşînê ye.

Di 7.03.1925 an de Şêx Seîd pîran şoerşa xwe li Bakurê Kurdistanê dest pê kir,ew jî ji bo Kurdan waneyeke çekdarî sudar bû. Di 11 Avdarê,sala 1970î de ,bi rêvebirîya M.Berzanî ji bo xudmuxtariya Kurdistanê hevpeymanana aştiyê bi destlata Îraqê re têtê morkirin,tevî ku rêcîma regezperst xalên hevpeymanê ne anîn rojevê û li hember Kurdan û cîhanê xwe rûreş kir, lê dîsan ew roja ji bo gelê Kurd weke nîşana

serketin û pêdariyê di eniya dîrokê de ronak hatiye tomarkirin. Em gelê xwe li Kurdistanê mezin bi van yadên mêjoyî pîroz dikin.

Wek me li jor goti bû; gelê Kurd di vê mehê de toşî pir rojên xemgîn û reş jî hatiye; di 5.03.1927 an de Ehmedê Baravî, şoreşvanê welatparêz, yê ku li dijî koledarên firensî şer dikir, hate darvekirin, pakrewaniya wî jî, di dîroka Rojavayê Kurdistanê de bûye nîşana dostaniya Kurdan bi gelê Erebiyan. Di 31ê Avdarê, sala 1947 an de serokê komara Kurdistanê Rojhilat Qazî Muhemed tev sê hevalên xwe li sêdara Şah Rizayê Behlewî bûn, vê bûyerê jî zameke kûr di gewdê tevgera azadîxwaza Kurdistanê de vekir. Di 6 Avdarê, sala 1975 an de hevpeymanî Cezair ya bêzar û reş di navbera destlatên Îraqê û Îranê de bi alîkariya Hewarî Bomedeyen û Kêsererê emêrîkî pêk hat, û ew pîlana herîmî û navnetewî ya ne mirovane ziyaneke mezin gihand şoreşê, û ewa ji bo demeke kurt aşbetal kir.

Her weha Avdara sala 1986an Newroza kurdî li rojavayê Kurdistanê bi xûna pakrewanê nemir Silêman Adî sor kir. Lê tiracîdiya herî gewre, birîna herî mezin di govde gelê Kurdistanê de, di 16 Avdarê, sala 1988 an de bû, ew roja kîmyabaranê bû, roja 5000 parkerawan li Helebce bê bext bû, ev roja bê xîniya helwesta civaka navçeyî û ya navdewletî di rûpelên dîrokê de bi xêzên sor, bi xûnên cangorîyan hatine çespanandin.

Huner û dengbêjiya kurdî di 9.03.1989 an de pir bi xemgînî dihat guhdarkirin, çimkî ewê di vê rojê de dengê xwe ye pir bilind, narîn, dilşewatê welatê xwe, dengbêjê **"Hey lê gulê , gula minê , ez te nadim bi malê dinê .."** bi hesret û kovana gula xwe (Kurdistan) çû dilovaniyê.

Di 21 Avdarê, sala 1990 î de xwendekara Kurd Zekiye Alkan li Kurdistanê Bakur bi canê xwe, yê mîna gulbuhara, li dijî zordestiya karbidestên toran protêsto kir û li pênavî azadiya netewa xwe bi vînek pola xwe şewitand. Di 4 Avdarê, sala 1991ê de firkeke nemaze di kêşa kurdî li Kurdistanê Başûr çê bû, di vê rojê de rapêrînê li Raniye dest pê kir û ewa li seranserê Kurdistanê belav bû, li dawîya dawî bi berxwedana pêşmerge û gelê qehreman, û bi alîkariya hêzên navnetewî (emêrîkî û birêtani) Kurdistan ji hêrişên dîktetur Sedam Husên hat parastin, û di encamê de, di sala 1992ê de perleman û hukumeteke kurdistanî, federala bi yek alî hate damezrandin. Niha Kurdistanê Başûr di buhareke siyasî, dîmokratî de têper dibe, û rolên herdu hukumetên Kurdistanê di

rûxandina rêcîma Bes de zor payebilind bûn, û îro jî rola hukumeta yekgirtî li Kurdistanê di avahiya Îraqeke dêmokrat û niştimanperwer de, di qada navnetewî de zor bala tete nirxandin. Di 23.03.sala 1993 an de gelê Kurd li Kurdistana Rojav toşî tawanbareke dirinde dibe, rêcîma şovenîst bi yarmetîya nokerên xwe li Hesekê, 72 Kurd di zîndana Hesekê de şewitandin . Di 12.03.2004 an de, dîsan destlata Sûriyê yekser û ne yekser agirekî mezin di navbera gelên Kurd û Ereba de li Qamişloyê vexist, ewê dixwast tola serketinên Kurdistana Îraqê û rûxandina rêcîma dîktetur li Îraqê bi riyên berdevk û şovenîstên Ereba jî gelê me yê azadîxaz bistîne . Lê xwendin û texmîna endizwarên vê pilana gemarî beravêtin. Gelê me li pêş çekên hemî dezgeyên Sûriyê serê xwe netewand, û bi mêranî raperîna xwe li Qamişloyê dest pê kir û ewa di Efrînê re derket, di encama raperînê de nîzîkî 40 Kurd şehîd bûn, û bi hezaran Kurd hatin zîndan kirin.

Lê pîrsa herî giring herdem ev e; rawestandina raperînê bi alîkariya bizava kurdî li Sûriyê rast bû, an şaş bû? Lê rîya bersivê hîn vekirî ye ...!!! Lê bê guman e, ku serhildana Qamişloyê û li seranserê bajarên Kurdistanê û li hin bajarên Sûriyê cihên serbilindîyeke pîr mezin û taybetî ne.

Miletê me bi bawerî û bi hêzeke xurt rabû ser piya, û daxwaza mafên xwe yê netewî kir û helwestên rêcîma kevneperest, û pirojeyên awerte, bi dengên bilind şermezar kirin. Dîsan gelê me li Kurdistana Rojava di Avdara vê salê de duhem salvegera vê serhildanê bi bîr anî, bi sed hezaran Kurd li goristana Qudurbegê li hev civîn û rûmeta pakrewanên serhildana pîroz girtin, bi axa gornên wan dilên xwe vejandin, herweh jî welatparêzên Kurd li gelek bajarên ewropî xwepêşandanên bîranînê kirin û rêvebirên dewleta Sûriyê bi tundî riswa kirin. Em bi bîranîna van hemî yadên bêzar û reş serên xwe bi rêzdarî li ber pakrewanên Kurdistanê ditewînin û hezar silav û rêz ji malbetên wan şehîdan re dişînin.

Wek em rewşa siyasî, aborî, li Sûriyê dibînin, hukumeta Dr. Beşar Elesed bi pîr gavan bi şûnda diçe, ewa zordariyên xwe li ser gelên Sûriyê bi giştî û li ser gelê me bi taybetî kêmtir kirî ye, ewa her rojê li dijî azadî û dêmokratîxwazan şewe û alavên nû diafrîne, rêcîma Sûriyê di navîna vê mehê de dîsan komcivîna Kurdan û Ereban li Şamê bi darê zorê jî hev

belav kirin, ewê bi riya xwendekarên xwefioş ji zanîngeha Şamê, bi çûv û lêdanên ters, xwepêşandana aştiyane ji hev şelandin.

Diyar e, li dawiya dawiyê gelek partî, hêzên Kurd û kesayetiyên serbixwe gihan vê baweriyê "**Rihên wan li ser riya Şamê bûn bost, lê rêcîma bees li Sûriyê ji ne bû dost**" lewra ji me dît, ku vê carê pir partî û kesayetiyên Kurdistanê Rojava vexwendina serokê konfiransa kurdî Dr. Şêrko Ebas li Waşontinê bi lez pejrandin, û nûnerên wan li wir di 14.03.2006 an de beşdar bûn, û ewanan civînên xwe li ser doza kurdî û duhatiya Sûriyê bi nûnerên Emerîka re kirin.

Cemawerê Kurd li hundir û li dervayê welêt vê gavavêtina pir partiyên bizava me di 14.03.2006 an de mîna firkeke siyasî zor erîni dibîne, û wê weke nişana rizgarbûnê ji kirasê rêzaniya kevneşopiyê dinexîne, lê li gor em dibînin, ev gavavêtina tenê, ne bese, ji ber ku, ta ku em Kurd kanibin di qada navnetewî de roleke pir bilind, karîger bilîzin, û baweriyên dêmokratîxwazên cîhanê pirtir bi hêzên xwe hûnin, divê hêzên tevgera me û li gel hemî welatparêzên serbixwe, rewşenbîrên jêhatî bê rawestan xwe ji pirojeyê neşîmanî berferê re amede bikin, çimkî bê yekdengiya kurdî, tu kes ne li Sûriyê û ne li cîhanê dikane rêzê li tevger û mafên gelê me bigre. Em hez dikin, sergotara xwe bi çend peyv û şîretên nemir Qazî Muhemed yê li gelê Kurd kirine li vir bi rêberên gelê Kurd li her çar perçên Kurdistanê bi bîr hûnin; ewî goti bû: "**Dijmînen Kurdan gelek in, setemkar û zordar in, û ewanan dilovaniyê li me nakin ... Nişan û riya serketina her mîletekî di yekbûn û hevgirtina wî mîletî da ye, û bê yekbûn û hevgirtin, mîletên bindest, dê her bimînin bindest.**"

18.03.2006

Şayirê xerîbiyê Fêrîkê Ûsiv

Wezîrê Eşo

Çiqas jî Fêrîkê Ûsiv wek şayirekî Kurd li welatê bav û kalên xwe kêm deng daye, lê di nava Kurdên Sovyeta berê, û bi taybetî Ermenistanê de, li kî derê ewî jiyana xwe û nivîsandina berhemên xwe bi cî anîne, wî wek helbestvanekî herî bi kemal û bi ser de jî mezin dihesibînin.

Di sala 2004 an da, sed mixabin, piştî mirina di 63 saliya xwe de, 70 saliya ji roja ji dayikbûna wî kuta bû, lê temambûna vê sersaliyê bi jêhatî dervay Sovyeta berê û Ermenistanê deng neda. Rastir, wek dibêjin, bi kerî hate buhurandinê.

Min, weke nivîskarekî Kurd û hogirê Fêrîkê Ûsiv yê pênûsê, hewilda bi nivîseke xwe vê sersala şayirê gorbuhuşt Kurdên Ewropayê û derên din bidim agahdarkirinê, û hetanî ew nivîsa min jî hate bi cî anînê, amadekirinê, lê bi sebebên dervayê daxwaz û hemdê min ew merema min nehate bi cî nehat. Ez sûckarên vê yekê bi nav nakim, lê ez nikarim wan rêxistin û dezgehên çapemeniya kurdî, rexne nekim, ewên ku bê xem û bê deng ber hinek bûyerên edebiyat û çanda kurdî ra dibuhurin, û bi ser de jî xwe wek welatparêz û miletparêz kifş dikin, û ne tenê înisiyatîvekê pêk naynin, lê bi awakî eşkere înisiyatîva hinek kesên wek min bînpê dikin. Ber vê yekê jî, weke min got, sersala roja ji adyikbûna helbestvanekî weke Fêrîkê Ûsiv bê deng hat û buhrî.

Evê yekê ez pir êşandim, xemgîn kirim, û min biriyar danî gorî vê gotina gelê Rus, merema xwe û nemaze berpîrsiyariya xwe hindava Fêrîkê Ûsiv da bi cî bînim: „**Baştir e bi derengî be, lê ne yekcarî tune be**”

Raxistina jînenîgarî û kar û barê helbestvanekî weke Fêrîkê Ûsiv di nava gotarekê da, çiqasî jî ew berfireh be, ne gengaz e. Ber vê yekê min biriyar danî, ku dest ji nivîsandina gotareke bi awayê standart bîkşînim, û her bi tenê hinek nêrîn û dîtînen xwe, ku pêwîstir dibînim, ser helbestvanê hizkirî, jiyan û karên wî raxim ber çavan.

Ez ber wê yekê van nêrîn û dîtînen xwe pêwîst dibînim, ji ber ku ew cara yekemîn tên eşkerekirinê, û bilî min belkî yekî din nikaribe jî vê yekê bi

cî bîne, ji ber ku yên dikarîbûn pirî-hindikî bi cî baniyana, ewana bi piraniya xwe ve weke Fêrîk xatirê xwe ji vê cîhana ronîk heta – hetayê xwestine. Di vî warî de, eger em dikarin waha bêjin, pîrlêvîjîk, serdestîk min heye, ne ku bi tenê haya min, wek hogirê Fêrîk yê zarotiyê û nêzîk, ji pir kesan bêtir ji jiyana û karkirina wî, lê her wa ji wan bûyeran jî heye, yên ku ji alîkî da, karaktêra wî, weke mirovê Kurd, weke şayir din, kar dikim, ji aliyê din va jî, ku tiştêkî pir giring e, û dirêkt girêdaye vê nivîsa me va, sedema tirajêdiya wî wek helbestvanê Kurd yê welatparêz, miletparêz. Wek min got, min nivîsa xwe ya ser Fêrîkê Ûsiv, beriya salekê zêdetir bi mûnasebeta 70 saliya bûyîna wî. amede kir bû.

Di nava ezmanê helbestvaniya Kurdên Sovyeta berê da, ji salên 50î yên sedsala 20ê û vir da çend stêrkên geş yên wek stêrka serê sibê derketin û di nav wan da yeke here geş stêrka fêrîkê Ûsiv bû. Lê tu were û vê ecêbê, vê paradoksê mêze bike: Ji berê da, ji kevin de di nava pir salan da, û di wê jimarê da, di nav gelê Kurd da ev bawerî çê bibûn: Mirovên bextewar ra digotin „ **Stêrka wî li ezmanan geş dîtseyse** „. Lê çiqasî jî Fêrîkê Ûsiv wek helbestvan şibêta stêrkeke geş li ezmanan kifş bû, lê ew di jiyana kesayetî da qet jî bextewar ne bû, û loma jî, ev gotin qet jî hinava yên weke wî da nehatiye bi karanînê. Çima?. Ji bona em bersiva vê „ Çima „, yê bidin, em gotî bendan, parantêzan vekin.

Li Sovyêta berê û bi taybetî li Ermenistanê bawer bikî helbestvan û nivîskarekî me yê usa tune bûye, ku weke Fêrîk di zindîtiya xwe da bi jîhatî hatibûya nirxandinê û bi ser da jî hizkirinê, ku weke wî zindîtiya xwe da ewqas pir deng dabûya. Tê bîra min, gava salên borî (yên sedsala buhurî) li paytexta Ermenistanê – Yêrîvanê – bi destê şewîra xwendekarên Kurd şevên Kurdan çê dibûn, Fêrîk di wan şevan da helbestên xwe ezberî digotin. Û tê de heyecan, ruhdar hebû û şabûneke mezin di nava ciwanên Kurd da çê dibû, ji deng û seda çepklêxistan û girîkirina wan ya zemandirêj, te digot eveke banê serayê wê ji cî rabe û li ezmanan keve. Bilî xweşbûna naverok û şîklê helbestan, aktiyorbûna Fêrîk jî rola xwe di çêbûna vê heyecanê da dilîst, ewî bi dengêkî hêle, bi miqam, bi awaza şîrin, bi hejandin, bawêşînkirina çepik û çengan, gorî mûzîka hundirî, helbest dihanîn ser zarê xwe.

Belê.. Fêrîk bibû gola şayan, û şevan, civîn û rashatînan, û, weke dibêjin, xelk ji bejin û bala wî ya xweşik, ji nûr û nedera rûyê wî, û bi hesabê

dawî, ji bihîstina helbestên wî, têt nedibû.

Di jiyana wî ya şexsî da jî qisur û kemasî tune bû. Keça malbateke hêja, ya bi perwerdeyeke baş û kurdewerî keça ronakbîrê bi nav û deng Heciyê Cindî – Firîda ronakbîr (mamosta) ya weke xanim û xatûneke kurmanciyê ji xwe ra xwesti bû, keç û kurek, weke dibêjin, gulançezêrîn -Zerê û Zoro dû wan ketibûn. Lê dîsa jî, bengzê wî xweş nedî bû, lê dîsa jî tabetî nediket wî, rehetî nedidît.... Got: „ ***Ezê vê qerebalixê bi cih bihêlim, , vê teqereqê, vê qalmeqalma bajarê giran (yanê Yêrîvanê) li şûn xwe bihêlim û herim gundê zarotiya xwe, gundê Kurdan – Pampê- (nika Sîpan e, li navça Ermenistanê ya Aragasê) belkî li wira ji bo rehetî, aramîke ruhî, wek ker û lakliya gund çê bibe*** „.

Ewî rêdaksiyona axiftinên kurdî yên radyoya Yêrîvanê berda, û çû dibistana gundê xwe û li wir, bû mamostayê ziman û edebyata kurdî. Tiştêk ji vê yekê, ji bo wî çê nebû, dîsan eynî xem û xiyalên giran, dîsan eynî nedîtina cîyê xwe di nava jiyane da li wî vedigerîn. Li vî gundî zarotiya xwe derbazkir bû, û wek jiyana xwe jê hezdikir, dîsa Fêrik li wir rehetî û aramî, ku ew hêvîdarê wê bû, nedît.

Dêmek ewî zanî bû, ku mirov wî aciz dikin, û ber vê yekê jî, ji wanan bi dûr diket. Helbet, ne bê bingeş, ne bê sedem weke mirovekî paqij, dirûst, helal ewî ji dirûtîyê, menfetçiyê û nemaze sebebkarîyê, nefret dikir. Ew radi bû, hildikîşîya serên çiyayên dora gundê xwe, yên Dibûrî, Qemerday, Xama, ji wir da û li jor li gundê xwe yê weke bûkeke rû bi xêlî xemilî mêze dikir.. Dîsa nedi bû ,tiştêkî, rastir, wek dibêjin, ji wir dîsan dernediket.

Ew vejeriya Yêrîvanê, ew dîsan beşdarî civîn û şevên ronakbîran û nemaze nivîskaran dibû, lê li vir jî moralê wî eynî dima, û carina ji ber êş û jana ruhî ya hundirî, tê qey bêjî bi sedem bê sedem jî dilê hinek heval û hogiran diket, ser wan da hêrs dibû, dixwst bi wê yekê dilê xwe rehetke, lê vajay vê, daxwazê çê dibû.

Tê bîra min, di civîneke me nivîskaran da ew ket pêsîra hogirekî me yê hêja, helbestvanê bi nav û deng Simoyê Şemo, û ew bi rûmet kir, ku zani bû ew diltenik û nazik e, zû birîndar dibe, diquse û ya here mûhîm, Fêrik ji ber dijminatîya hindava wî da wa nake, lê her bi tenê bin tehsîra hestên xwe da, yên demî da wa diqehire. Lê çiqasî jî hayame ji dilpaqijî û

helaliya Fêrîk hebû, piştî vê bûyerê Simo û em heval û hogirên dinê jî bi acizbûneke kifş, bi dilekî şikest, bi xemgînîke giran ji wê civînê derketin û çûn malên xwe.

Çend roj, weke tê bîra min, ji wê bûyera ne bi xêr û ne baş buhurî bûn, rojekê jî, gava ez weke xwe hercar çûm serlêdana hogirê xwe yê nêzîk; Simyê Şemo, ciyê karkirina weke doxtir, ewî bi beşereke xweş, bi rûkî geş wek mizgînîkê ev besa xêrê ji min re got:

- Tu zanî çi qewimî?!.

- Çi ?. Metelmayî min ji Simo pirs kir.

- Lê tu qet nabêjî, ku ez û Fêrîk li hev hatin...

- Bi çi awayî?. Vê carê bêtir metelmayî û bê sebir min pirsiyar jê kir.

- Ez çend roja berê di kolaneke Yêrîvanê da dimeşiyam, ku herim malê.

Simo dest bi gotina xwe ya eslî kir. Min hew bala xwe dayê, yekî ji pişt va, milê xwe di stûyê min ra bir, ez hemêz kirim. Ez ser milê xwe zivirîm; eva Fêrîk e. Ez benda vê hemêzkirina kê bûma jî, lê qet ya Fêrîk nebûm. Bi gotineke tel û şîrin tevlihev, bi beşereke merivê, ku sûcekî giran kiribe, wî sûcê xwe li xwe mukur bê, qebûl bike, ewî ji min ra got "Simo, em birê hev in, weke gelê me dibêje, **"berê du bistanan jî hev dikeve"**. Di wê rojê min neheqî li te kir, min tu çikî bela sebeb bê rûmet kir. Nika jî, ez ji te lava dikim, ku tu min efû bikî, guneh û sûcê min bibaxşînî min". Min ji reng û rû, bengz û bala wî, ji awayê gotina wî tecrûbe kir, ku ne ku bi tenê ew bê şalûzî, bê qelpî-qûlpî, weke dibêjin, dilê xwe li ber min vedike. Bi rastî li kirina xwe poşman bûye, lê ya herî giring, ew navbera van çend rojên piştî wê bûyerê ra, pir xemgîn bûye, ew xwe, xwe ketiye, û ji vê tecrûbekirinê destê xwe da, xeyd û hêrsa min ya hindava wî da ji min revîn, dûr ketin, û min bi ser da jî heyfa xwe bi wî anî, gunê min bi wî hat, ji ber wê rewşa wî ya moralî ya giran, û loma jî min ji wî ra get:

- Ez dibaxşînim te, Fêrîk, qet xemgîn nebe.

- Ha, ha, rast dibêjî?. Eynî wek zarokekî ji min pirsî.

- Serê bavo (her tim bi vî awayî bi serê bavê xwe sond dixwar) bê qelpî û şalûzî dibêjim, min bersiva wî da.

Piştî vê gotin û sûndxwarina min hêja, reng û rûyê wî yê resen û xwezayî hat şûna xwe. Bê galgal em bi hev ra pir meşiyam, te qey digot beriya çend rojan tu tişteki xirab, ne cayiz û ne hêja navbera me dea çê nebûye.

Pişt ra me bi kêfxweşi xatirê xwe ji hev xwest û em ji hev dûr ketin.
Piştî vê gotina Simo kêfa min jî xweş bû, te qey digot barekî giran ji ser piştta min rabû.

Eynî bi wî celebî Fêrîk lêborîn, baxşandin ji wan hemû bira, pismaman, heval û hogiran lava dikir, yên ku bi tecrûba wî, ewî bê sedemê bingehîn, weke dibêjin, dilê wan pirî – hindikî eşandi bû, û dawiya dawiyê ewî, bawer bike, ewî şexsekî wisa nehişt, yê ku ji wî xeyidî, dilmayî mabe an hêşt, ew bi hemûyan ra li hev hat, bi wan ra li hev rûnişt, û ez niha ji dûraya zemîn, gava careke dinê ser vê yekê da diramim, xeyset, karaktêra Fêrîk ya mirovayetiye, dilsoziye, helaliye, ciwamêrtiye, û comerdtiye hêja zelaltir bi min va, bi temamî û tam bi min va xanê û diyar dibe.. Ez ji nû va bêtir vê yekê tecrûbe dikim: Mirovên bi ruhiyet û sewiya (nîvaya) bilind û dewlemend, yên eynî weke Fêrîk ruhmezin, ne ku bi tenê kêmasî û şaşitiyên xelkê dibînin û dibaxşînin wan, ya herî girîng, kêmasî û şaşitiyên xwe, hetanî sûcê xweji dibînin û qebûl dikin, li xwe muhur tînin, û vê yekê qet jî weke xwebiçûkkirin, xwekêmditînin nabînin. Mirovên bi rastî biçûk ji xwebiçûkkirinê ditirsin. Û ya din, dilekî mîhrebî, pir hestwer û nazik li Fêrîk bû, ew weke pela gulê, ne bi tenê jî peyveke ne xweş, tel, lê bi ser da jî ji nêrîn, aviruke tûj, yan jî sar, dilê wî diqusiya, eynî weke şextê li belgê daran, tûmê kûltûrayên bostanan û nemaze gulîstanan dixê, diçelmisî. Loma jî gava ew bi sedem yan jî bê sedem ji ber diltengiya xwe û tecrûbekirineke şaş, dilê heval-hogirekî diket, ew dêşand, lê zû bi zû li wê kirina xwe poşman dibû, ta ku mirov demeke dirêj xemgîn nebe, ber xwe nekeve, çimkî ewî zani bû, xemgînî çiqas giran e.

Dermafê sedemê xemgîniya Fêrîk, acizbûna wî ji jiyane bû , derheqê sedemê wê yekê da, ku ewî ciyê xwe ,di nav jiyane da nedîtî bû û loma jî ew bê tebat û aram bû , ezê pişt ra bi giranî bêjim, lê ezê li ser sebebekî vê rewşa wî ya moralê ya giran,sedemeke konkirêttir û rasterast rawestim.

Gira (pir hindik) rewşa Fêrîk ya moralê pir xweş û baş bû, bi serda jî nexweşi, zedekê, azareke bedenê û laşî ya giran, nexweşiya şêkir bi ser da hat, û li canê wî peyda bû. Evê nexweşiyê di navbera demeke kin da, navbera çend salan da, weke berasekî aşan Fêrîk di bin xwe da hêra, û ew tewand, ji zeman zûtir kal kir. Qerçomekên wek xetên cot li ser

dêmê wî yê gulî çê kirin (rind tê bîra min, Fêrîk xurtaniya xwe da pir xweşik, bedew bû)porê wî sipî kirin, û hetanî ji çavan da jî, ew belengaz kir. Ev guhêrandin wisa zû çê bû, ku me heroj û hergav, zû bi zû Fêrîk didît, me jî ew pîrosêsa kalbûna wî pir zelal û zû tecrûbe kir. Eva jî şûna xwe da eyan e, ku nexweşiya şêkir ne ku bi tenê Fêrîkî, lê li yalê morali, û di ruhiyetê da jî mirov dêşînê. Yên ku bi vê nexweşiyê dikevin, kêfa wan dişkê, bîna wan, dilê wan weke dibêjin, teng dibe, ewanan ser tişteki sivik jî aciz dibin, hêrs dikevin.

Ya bilî sedemê zû şikestina Fêrîk, ezê li ser yê din, di dawiyê da li ser rawestim, ev nexweşî jî, bû sedemê wê yekê, ku ew ji zeman zûtir, ji vê cihana ronik çû....

Du pirtûkên Fêrîkê Ûsiv, bi boneya 70 saliya ji dayikbûna wî li paytextê Ermenistanê ; (Yêrîvanê) çap bibûn, ewanan bi destên xarziya min Zozana Nûra Cewerî û Tosinê Reşîd gihîştin ber destên min.

Hesta şabûnê ya yekemîn, ji ber wê yekê di nava giyanê min da çê bû, ku weşandina pirtûkên helbestvanê me yê çûye dilovaniyê, û yê hezkirî, piştî koçkirina wî jî, berdewam e. Û min careke dinê jî, ev gotina gelê me “ Zêr li erdê namîn e “eciband. Belê ne tenê poêziya (helbestên) Fêrîk winda nabe, lê jiyana wî jî berdewam dibe, û bi wî re î, ya xudanê wî jî berdewam dibe .

Hesta şabûnê ber wê yekê jî li nik min çê bû, ji ber ku, yek ji wan berheman bi sernavê “ *Hisret* “bi kurdî, bi tîpên latînî hatiye weşandin. Ewa bi kurdî, hatiye çapkirinê, ji bo min tişteki metelmaynê û nû nîn e, ji ber ku helbestvanê me yê miletparêz berhemên xwe bi kurdî dinivisandin. Ji min ra girîng û tişteki şabûnê bû, ku ew pirtûk bi tîpên latînî hatiye weşandinê. Wek tê zanîn, di salên sî de, ji aliyên Kurdên Sovyeta berê da, bikaranîna tîpên kirilî, bi mecbûrî dihat kirin.. lewra, niha riya berhemên ronakbîrên me, yê efrandinker bi gîstî, û di nav wan de ,yên Fêrîkê Ûsiv, ber bi xwendevanên dervayê Sovyeta berê de diçe û nemaze ew di rojanama “ Dema Nû “ da hatiye weşandinê. Ez li vira dawiya gotina xwe derheqê wî da tînim.

Lê piştî Eskerê Boyîk, pisporekî wêje bi gîstî, û yê wêjeya kurdî bi taybetî, pisporekî naskirî, wêjevanê Kurd yê bi nav û deng Çerkezê Reş, dest avêtiye karê lêkiolîn û nixandina poêziya Fêrîk. Pirtûka Fêrîkê Ûsiv ya duhem, ya bi sernavê “ Ber kenarê cewîka çîyan “ bi wergera ser

zimanê ermenî, dîsa li Yêrîvanê, bi pêşgotina Çerkezê Reş dest pê dibe, û bi bîranîna 70 saliya helbestvanê nemir li Rewanê, di sala 2004 an de hatiya çapkirin.

Hesta şabûnê ya din li nik min, ji bona vê kitêbê, û nemaze ji bo vê pêşgotinê, di nav giyanê min da çê bû. haya min baş ji jînenîgarî û poeziya Fêrîk heye, bi vê pêşgotina wêjezanê me yê hêja, tu qey dibêjî, min jiyan û karkirina helbestvanê me, ya efrandinê ji nû va, û hîn zelaltir dît. Çerkezê Reş çend rûpelên bi naverokên xwe six, di hev da, bi nêrîn û tecrûbên kûr va, temamiya babet, naverok, bîr û bawerên poeziya helbestvan li ber çavan radixe. Bilî ku Çerkezê Reş pisporê wêjevanê yê kûr e, ew wekî din jî baş ji Fêrîk têdigîne, çimkî ew bi xwe jî Kurd e.

Li vê tengê, mirov çawa kane gotina Almanê mezin Wolfgang Geotê, bi bîr nîne, ewî gotiye; **ku eger tu dixwezî ji helbestvan û berhemên wî rind têbigînî, divê tu wî welatê, yê ku ew tê de jiya ye , nas bikî.** Ez jî bi ser vê gotinê de dixwazim zêde bikim. Ji bona kûr famkirina êş û jana Fêrîk û nemaze sedemên çêbûna wê êş û janê, divê tu ji miletê wî bî, û eger qet ne bû, divê tu di jiyanê da, wî hinekî nas bikî.

Çerkez ji van hemû tiştan bê par, bê beş nîne. Ji ber van sedeman jî em dikarin bêjin, ku her bi tenê yekî weke Çerkezê Reş wê bikaribûya di nava 6 rûpelan da jiyanêke pir dewlemend, poeziyake pir kûr û bilind, zelal li ber çavan raxista.

Gava were gotin, ku jiyan û nirxandina berhemên Fêrîkê Êsiv hatiye kirin, em nikarin vê pêşgotina bi sernavê "Rûpelên jiyanê Fêrîkê Êsiv" ya ku helala wî ,hogira wî, ya jiyanê Ferîde Hacî Cewrî ji bo pirtûka Fêrîk "**Hesret**" nivîsiye , bi bîr nînin.

Ferîda Hecî çiqasî jî ne wêjevana pispor be, lê ev pêşgotina wê ji bo me; aşiq û maşoqên poeziya helbestvanê rehmetî, wek diyarkirineke nû, wek tişteki teze ye, û bi ser de jî, ewa giring û pêwîst e, ji ber ku, ewa wek mirov ji Fêrîk ya herî nêzîk bû, haya wê baştir ji jiyan û awayê karkirina helbestvan, ji jînenîgariya wî ya bi tirajêdiyayê va dagirtî heye. Ê ya herî giringtir, ewê jînenîgariya wî zelal û bi eşkeretî ber çavên me re bê perdekirin, û veşartina hinek berhemên wî û çend bûyerên ji jînenîgariya wî, yên mayîn raxistiye .

Gotin û dîtinên wê, yên li ser nimûneyên jiyanê helbestvan ,bi nêrîna

destpêkê de, wek tiştên ne ewqas giring û pêwîst tên kifşkirin. Lê gava em di wan da, kûr û dûr diramin, em dibînin, ku ewanan ne tenê ji bona nirxandina jînenîgarî û berhemên helbestvan pir pêwîst in, lê her weha ji ewa ji bo pênasîna karaktêra wî jî wek mirov û Kurd giring e .

Rûpelên li ser dema jiyana Fêrîk ya dawî û awayê mirina wî di nexweşxaneke Yêrîvanê da, ji me ra nemaze pêwîst û balkêş in. Gava mirov di pêşgotina Ferîda Hecî da, derheqê hatina wî da ji Rûsyayê, piştî xerîbiya çend mehan, giranbûn, zorlêkirina nexweşiya wî, û di dawiyê da, mirina wî da, dixwîne, agir bi dilê mirov dikve.

Ji vê nivîsê em meznayke ruhê Fêrîk dibînin. Em pê dihesin, ku gava di rê da nexweşî lê giran dibe, ew ne ewqas ji wê yekê ditirse, ku dikare bimre, lê ew bêtir ji wê yekê ditirse, ku ew bi sax û silamet nikaribe bigihîje mala xwe, neferên xwe, yên hizkirî û yên ku ew di hisreta wan da bû, ku bibîne, here Pampa, ax û kovana dilê xwe, hên gava ew ji balefirê peya bû û hat gihîşt mala xwe, bi dilxweşî weha got: “ Şikir ji te ra xwedê, ez hatim gihîştim malê..”. Lê malîvanan zanî bûn, ku eva qonax, hêwirgeha wî ya yekemîn e, ya duhemîn wê Pampa wî ya hisretî û hizkirî be. Bi rastî jî got: “ ***Ezê du-sê rojên din herim gund. Par min terka gîhadirûnê da, îsal jî ezê terka kartolavêtinê bidim. Hela wê kî bi min ra nîvekarî bavêje?!.***” Bi ser da, ev gotina xwe bi peyvên, helbestvanî anî:

Li min pir bûne nexweşî û êş.

Nexweşiyê nemam, xirav û xayin...

Nexweşik jî heye, nahêle rehet.

Kêfîm xwe ra, tev heval hogira...

Fêrîk dilezand, here Pampa malbav û gundiyan xwe, Pampa, zarotiya xwe ya wek hikiyateke zêrîn e, Pampa meha Gulanê ye, gava weke straneke kurdî da tê gotin, gul û sosin tev diseridin, gava çiya û banî, mêrg û çimenên wê bi kulîlkên hezar rengî va dixemilin. Fêrîk dilezand, ku bihara Pampê bibîne, lê vê carê qedere dîtina gundê hisret û kovana dilê wî nemirî, bû qismetê wî. Ewî rîya bi hezarên kîlômêtran bi cî anî bû, her bi tenê 60-70 kîlômêtir mabûn, ku ew bigihîje armanca xwe, lê merem û daxwaza wî di dil da ma.

Gava nexweşiyê lê zor kir, lê giran bû, ew birin nexweşxaneke Yêrîvanê. Li vira rewşa saxiya wî demekê baştir dibe. Lê piştî du-sê

rojan, gava lawê wî Zoro diçe serlêdana bavê xwe, ew ecêbeke giran dibîne: Çend doxtir, weke dibêjin, hilkişiyane ser bavê wî, ewî derzî dikin, û hewil didin, ku dilê wî nesekine, yanê jî ew belkî sekiniye, lê dîsan wî bidin xebatê. Û gava Zoro li reng û rûyê bavê xwe, awayê nêrîna wî mêze kir, tê derxist, ku ew di rewşeke pir giran da ye, eger ew ne ber ruh da be, lê gava ew “ Bavo-bavo “ dibêje, xwe davêje pêsîra bavê, û bav jî her bi tenê bi hêsireke çavan bersiva lawê xwe, yê hizkirî dide; êdî ew ji zar û ziman ketiye, û helbestvanê, bilbilê Kurdistanê, yê ku pir salan ji cîhanê, Kurdistanê û miletê xwe ra bi dengêkî xweş û bi dilekî birîn xwendî bû, peyivî bû, ewî her bi tenê, bi hêsrekê xatirê xwe ji lawê, ji vê cîhana ronik, ji welatê xwe, ji miletê xwe heta-hetayê xwest. Gelo emê vê bersiva çavê Fêrik ji bîr bikin?!. her bi tenê, ew xwerû hêsir nîn e. Temamiya tiradêjiya jiyana wî di wê hêsirê da cîriya bû ser hev û loma jî, ewa ji bo me tiştêkî pîroz e.

Fêrikê Ûsiv di 3ê Gulana sala 1997 an de can da. Her bi tenê mirina bêwa dikarî bû Fêrik di nivê rê da bihêle, û ne ku bi tenê riya Pampê. Ewî wê demê besa riya Kurdistanê nekir, çimkî ji ber rewşa saxiya wî ya giran, ji ber tunebûna îmkânên (karînên) bi cîanîna wê mexsedê ne tiştêkî zêde bû. Lê eva qet jî nayê wê wateyê, ku, weke dibêjin, ewî riya Kurdistanê ber xwe nexisti bû, yanê bi awakî din jî tînin ser zar, riya Kurdistanê neda bû ber xwe. Stûyê wî geriya û bi yalê Kurdistanê, ser Cizîra Botan, Diyrbekirê, Wanê, Hewlêrê, Silêmaniyê, Mehabadê, Qamişloyê û Qersa bav û kalê xwe de mêl û xwar bû .

Dîtina van jî wek ya Pampê hetanî roja qiyametê bû. Di derheqa wê yekê da, armanca Fêrik ya herî pîroz û dawî çûyin, dîtina û mayîna li Kurdistanê bû. Helbesteke wî pir zelal şedetiyê dide, ku emê niha weke nimûne û îsbat (teqez) binin zimên .Lê beriya şirovekirin û nirxandina wê helbestê, pêwîste em tiştêkî din jî bêjin.

Fêrik bi fikreke dinê jî di nivê rê de ma. Ez bawer im, ku eger nexweşiya giran nebûya, û wê nexweşiyê, fersend û keys bidayê, ewî, wê hîn pir berhemên hêja bi cî baniyana, çimkî hiş û sewdayê wî bi pir babetên cihê, cihê va dagirtî bû. Eger qet ev neba jî , dê bîranînên xwe ji me ra bihiştana, û ewa ji me ra weke nêrîn, dîtînen helbestvanî ,bi kemala mezin ser mirovayetiye û cîhanê, ser rewş û qedera Kurdan û Kurdistanê wê pir giring bûna Lê, weke jîyan îsbat (teqez) dike; du kerem li cîhekî;

talant,kemala mezin (dayina mezin) û saxiya baş bi hev ra, heta-hetayê, heta dawiyê nameşin..

Em niha dîsa veşerî ser berdewamkirina gotina xwe ya bingehîn, ya nîrxandina çend berhemên Fêrîk, nemaze yê di pirtûka wî ya nû “ **Hisret** “ da ne.

Gava min berhemên Fêrîk di du pirtûkan de xwendin, tu qey dibêji; poeziya Fêrîk ji nû va zelaltir, pîr rengî, pîrawazî û kûraya xwe, taqên xwe yê weke stêrê kurmancî gelek li ber çavên min vekirin û raxistin, û min hinek helbestên wî ji nû va, rastir, bi nêrîneke nû va xwendin, û ji nû va hinek awaz, taybetmendiyên wan tê gihîştin. Ewe helbestek ji wan helbestan:

Bera xwezil Kurdistanana min şên bibûya!..

Miletê min aza, xwendî û zên bûya!..

Derge-dîwan bi ziman û zarê min bûya!..

.....

Bera hingê ayê şevê li minhisret bûya.

Keleftêkî mêran min ra cî-star bûya.

Qerpalekî reş li stûyê min da xar bûya.

Bera gêzîke dergevana destê min bûya.

Kolaneke Êl-Cizîrê posta(1) min bûya .

Li vê tengê em gihîştin navika şirovekirin, zelalkirin, makirina babeta vê nivîsa xwe; eşkerekirina sedemê tirajêdiya Fêrîkê Ûsiv wek helbestvan , wek ronakbîrekî Kurd yê welatparêz. Ji vê helbesta wî, ya ku me li jor anî zimên, zelal û kifş dibe, ku tirajêdiya Fêrîk ne di nav nexweşiya giran da bû, û ne ew bû jî, ku weke gundiyê berê, ewî û rehetiya xwe di nav bajarê giran, yê bi qalme-qalm, bi qirejir da nedidît, aciz dibû, trajêdiya wî ne di nav wê yekê da jî bû, ku li dora wî, mirovên xirab, nemam û ziyandar hebûn, (Fêrîk baş zanî bû, ku mirovên bi vî awaî li her deran û li Kurdistanê jî bi xwe hene), tirajêdî li nik wî ne ew bû jî, ku ew di nav xerîbîke bê hêrî da dima, lê trajêdiya wî ya rastîn ew bû , ku welat û gelê wî hên bindest û ne azad bûn. Weke ew bi xwe dibêje: milletê wî azad be, û gerek e dîwan li welatê wî bi ziman û zarê wî bin, di we demê de, ew amade ye, destên xwe ji helbestvaniya xwe, xwezayîya ji xwedê da, ji pêşê qazanckirina nav û dengê bilind bikşîne, û li şûna pênuşê, ew dixwaze dergevantiyê bike, û li kolaneke bajarekî

Kurdistanê, yê dîrokî jî zibilê paqij bike.

Li vê tengê, tirajêdiya Fêrîkê Ûsiv ji ya kesayetî, dibe ya temamiya welatê wî, ya temamiya civaka kurdî, rastir, sînor di navbera tirajêdiya wî ya kesayetî de û ya gelê wî da namîne. Eger em vê ramana xwe, zelaltir bînin ser zarê xwe, ku Fêrîkê Ûsiv tirajêdiya miletê xwe wek ya xwe ya kesayetî dibîne, û bextewariya xwe jî di nava bextewariya gelê xwe da dibîne. Ev e ji we ra, welatparêz û miletprêzê resen.

Tirajêdiya Fêrîk ya kesayetî ji ya welat û miletê wî dihat, eva jî zelaltir di helbesta wî ya bi sernavê “ Kurdistan “ da kifş dibe. Di dawiya vê helbestê da, weke ji peyvên wê ronî dibe, ew ji dûr va, ji cihwarê xerîbiya xwe bi kovaneke kûr bangî welatê xwe, yê li ber wî hindabû ye, dike û dibêje:

Kurdistan kuz, Kurdistan?

Wey dîl û bindesta min....

Em pir Kurd li ser êxsîrî û bindestiyaya Kurdistanê dipeyivin, her weha em van peyvên dubare dikin, çimkî, weke dibêjin, ghuhen me fêrî bihistina wan bûne, ew bandureke pir giran li ser giyan, sewdê me û yên guhdar û xwendevanên me nakin. Lê gava tu van her du rêzên Fêrîk dixwînî, bê vîna te , weke dibêjin; kela girî dide qirika te. Ev hest û his ber wê yekê çê dibe, çimkê ewî di van rêzan da hunermendiya bilind bi kar û cî anî ye. Belê Fêrîk bi awakî din, rastir, bi awayê xwe, yê helbestvaniya resen rewşa welatê xwe tîne ser zarê xwe . Ew Kurdistanê her bi tenê weke erd, axa bê giyan nabîne. Ew Kurdistanê dişibîne ruhberê rastir, mirovekî ji netew, ji nîjad, ji xwîn û ji cegera xwe, ya ji bo xwe ber vê yekê jî, gelekî rêzdar û giranbiha dibîne û ew xwendevanên xwe jî ber bi eynî dîtîne ve nîzî dike û loma jî, em ji vê gotina wî, ne tenê xemgîn dibin, lê bi ser da jî, agir û alav bi dil û cerga me dikeve. Ev hunermendiya Fêrîk ya helbestvaniyê ya bilind hêştiye, ku berhemên wî bandurên xwe yên mezin li ser xwendevanên wî çê bikin .

Di van du xetan da tiştêkî din jî diyar dibe, ku bêtir dilê mirov nahişîne. Fêrîk li vir weke rêwîkî, ku regeza xwe Kurd e, kifş dibe. Ew û bi taybetî dibêje: “ ***Kurd im...***” . Û ev kurdê han, weke kifş dibe, cara yekemîn riya welatê xwe; Kurdistanê daye ber xwe, çimkî eva çûyîna wî ya yekemîn e, ber vê jî, riya welêt ji bo wî Kurdî xalifî nenas û xerîb e, û loma jî ew di wê rê da dixalife, riya xwe nabîne û bîr dike: “ ***Kurd im,***

ku yî, Kurdistan “. Belê ehwara xwe di wê rewşa xwe ya giran da li welatê xwe dadixe. Ez vê yekê dişibînim mîh, maka teze û berxikê wê yê vîrnî û xeşîm. Ewan ji dûr va, di nav çîyan da her nabînin, lê ewanan bi hest û hisan her dihesin û bi kalîn ber bi hev dilezînin; ser hev da dikalin,. Tu nizanî ji van herduyan, ji Kurdistana mak, dayik û berxikê wê bêtir di hal û rewşa kîjanî da bigirî, bêşî û xemgîn bibî, ji ber ku, weke helbestvan dibêje, Kurdistan jî di rewşeke giran da ye, dîl û bindest e. Lê ya here bi seyr û ecêb ew e, ku Fêrîk di nav du xetên helbesta xwe da, ku serî-binî ji heft peyvên pêk hatine, temamî tirajêdî û rewşa Kurdistanê û ya kesayetiya xwe jî, wek lawê wê, bi pê ra raxistiye ber çavan. Hema ev yeka hunermendiya Fêrîk ya helbestvaniya bilind tete hejmartin.

Gava gotina min hatiye ser welatparêziya Fêrîk, ser nîrxandîna helbestên wî, poêziya wî ya miletparêziyê, ezê mîsaleke din jî bînim zimên .

Ewî serok û sermiyanê Kurdan; Mistefa Barzanî yê nemir jî kiriye pêsonajekî berhemên xwe, bilî wê yekê, Fêrîk xudanê hunermendiya helbestvaniyê ya bilind e, hest û hisên welatparêziya wî bi şewat e, ew bi nixta xwe ya helal û zelal di helbestekê xwe da, li ser nemir wek koçek, remildar, falvekir û pîldarekî jî kifş dike.

Di helbesteke xwe da, ya bi sernavê “ *Bavmezîne Kurda Mistefa Barzanî ra* “ ew bi ax û kovaneke kûr weha bang dike:

..... *Ax, yabo, xwezil,*

tu naha sî, yanê çil salî bûya!..

Fêrîk mirovekî ewqas basît ne bû, ku haya wî ji felsefa gelê wî ne bûya, û bi gîstî jî, ji felsefa gelên din. Lê gorî wê felsefê, gava dua-dirozgan li miroevkî hizkirî dikin, ji wî ra temen, emrê dirêj daxwaz dikin. Lê ewa, Fêrîkê Êsiv, yê ku ev helbesta xwe di sala 1972 de nivisandîye, ew ne ku temenê dirêj ji Barzaniyê nemir ra daxwaz dike, lê xwezîla xwe bi wê tîne, ku nemir di wî zemanî sî yanê çilsalî bûya.

“ Helbet gava min ev helbest xwend, ez di dilê xwe da fikirîm. Li vira sedemeke vê gotinê heye, ku Fêrîk ji me ra ronî û zelal nekiriye, rastir ew tecrûbekirina merema vê gotina xwe li benda xwendevanên xwe hêştiye. Hilbet di vê gotinê da, ewî daxwazeke xwe ya konkirêt, bi awakî perdekirî kifş kiriye “ .

Piştî mitalên, weke dibêjin, dûr û dirêj ewa bi min ra çî diyar bû. Gava

Fêrîk ev helbesta xwe nivisiye, temenê nemir 69 sal bûne (ew di sala 1903ê da hatiye cîhanê), eger daxwaza Fêrîk bi cîh bihata,ew di dema nivisandina wê helbestê da 40 salî bûya jî, wê dîsa rewşa Kurdistana Başûr ya baş, weke giravekê azad di dilê Rojhilata Nêzik da bidîta. Rastir,dê keda xwe ya pir salan bidîta, û derd û kulên bindestiya temamiya welêt û yên vê beşa wî jî, di dil da nediçûne nav ax û berên sar. Weke dibêjin, tiştêk niqîtî bû dilê wî, li cem wî xûya bû, ku piştî demekî bûyerên werguhêziya bingehîn, wê li Kurdistanê çê bin, û Kurdistana Başûr, wê desturekê wek ya dewletekê bistîne.

Ez bawerr im, ku ev yeka niqîtî bû dilê Fêrîk, ji ber ku, ew kurdekî helal, paqij û bi rehm bû. Gava em van texmînan li ber çavên xwe re derbaz dikin „em ji nû ve sedema daxwaza helbestvan têdiginin., ya ji bo wê yekê, ku di dema nivisandina wê helbestê da, nemir sî yanê çil salî bûya, ku bê tecrûbekirina vê yekê, ew daxwaz bi xwe weke tiştêkî ecêb, paradoks bi me ra kifş dike.

Ez gihîştin qonaxeke wisa, ku piştî me hemû gotinên xwe yên li jorê kifşkirî, lê ne gengaz e ku ez hemu nirîn û ramanên wî bixim zikê hev, ser hev da bînim, bicivînim, û nêrîna xwe ya tamam û tomarî ser Fêrîkê rehmî wek mirov , helbestvan û nemaze welatparêz bînim ser zimên, nixandina poêziya helbestvanekî weke Fêrîk bi tamamî karekî hêsan nîne,û di gotarekê da bi cî nabe.

Fêrîkê Ûsiv barekî giran, barê derd û kulên welatekî berfireh û gelekî bêtirî 40 mîlyonan. hilgirti bû ser milên xwe. Loma jî ewî nikarî bû demeke dirêj ew bara ragirta, û li ser piyan bima. Ew di bin wî barî da mêl û xar bû, û ket. Lê çiçasî jî, derdê wê ketina Fêrîk giran û dijwar be, dîsan jî berbîneke mezin ji me ra bi wê ramanê çê bûye, ku ew weke helbestvan bi berhemên xwe zindî ma ye, û ji ber ku, ewî giyan, bîr û bawerên gelê xwe xistiye nav helbestên xwe, ew dê bi gelê xwe ra jiyana xwe berdewam bike. Loma jî, em bê guman dikarin bêjin; ku hetanî gelê wî li cîhanê heye ,Fêrîk jî zindî ye .

(!) Post : bi zimanê rûsî ye, li vê tengê tê wateya wî perçî, an jî beşî, ku bi pîvan ser dergevanekî kifş û qeyd dikin, ji bona paqijkirina wî erdî ji zibilê.

Çend têbînî û gotareke C. Bedirxan

Şahîne B. Soreklî

Hawar dengê zanîne ye. Zanîn xwenasîn e.
Xwenasîn ji me re rêya felat û xweşiyê vedike.
Her kesê ku xwe nas dike; dikare xwe bide naskirin.
Her kesê ku xwe nas dike; dikare xwe bide naskirin.
(Celadet Bedirxan: HAWAR, hejmar 1 / 1932)

Bê guman birêxistina kampanyayeke bo zimanê kurdî derfeteke di cîh de ye û hêvîdar im amancên erênî bi dest xe. Di nav 25 salên derbas bûnî de bi dehan gotar derbarê vê pirsê de hatin nivîsandin lê, mixabin, gavên mezin derbarê baştirkirina rewşa xwe bi zimên ve girê dide nehatin ranan; nehatin ranan çimkî kampanyayên berê û yên nuha ji bilî daxwaz û hêviyên atîfî ne tişt in. Em hemî dizanin ku nexweşiyek di nav Kurmancan de heye lê em nikarin ji vê nexweşiyê re dermanan bibînin. Va bûn bêhtir ji sed salan bizavên weşandina rojname û kovarên kurdî dihên kirin lê di heman demê de ji rojnameya Kurdistan û kovara Ronahî bigir ta rojnameya Armanç û kovara Nûdem hemî ji birçîna mirine.

Egerên nexweşiya xwe bi zimên ve girê didin çî ne? Egerên mirina rojname û kovaran di nav Kurmancan de çî ne? Bêguman gelek ji me dê bindestbûnê û bêdewletbûnê wek eger bidin. Hinekên din ê bibêjin ku gelek Kurd di malên xwe de zimanên din bi kar dihînin. Hinek ê bibêjin rêxistinên me tawanbar in. Lê diyarkirina van egeran têrê nake. Divêt em bipejirînin ku gelê Kurd, eger çî dibin jî, wek zewiyekî “bejî” ye, ku ji bo vî zewiyê “avdan” divêt. Lê ava ji bo avdanê pêwîst çawa dikare bihêt bidestxistin? Gotina “li zimanê xwe xwedî derkeve, bi kurdî bixwêne, zimanê me hebûna me ye...” gotineke durist e lê nikare bi milyonan mirov şareza bike. Propaganda dikare tîfîngê têxe dest kesan, propagandaya sîstematîk dikare mêjiyan bişo lê fêrbûn û perwerdekirina ranyarî tiştêkî din e. Her kes dikare xwe wek “siyasî” bihesibîne lê her kes nikare bêyî proseyeke perwerdeyî fêr xwendinê û nivîsandinê bibe. Kurd nema di nav kaşên xwe de ji bandora ziman û çandên din parastî

ne. Proseya asîmîlekîrîna wan li aliyekî bihêle, cîhana me biçûk bû ye. Di vê cîhanê de zimanên bi hêztir û yên ji bo bazirganiyê grîngtir zimanên biçûktir bi ber leheya xwe dixine. Di nav 25 salên derbas bûnî de bi dehan zimanên mirovan mirin. Îroj heta bi zimanên wek frensî û almanî be xwe di bin tehlûkeya zimanê îngilizî de dibînin. Ji çakbextiya me nuha çend televizyonên me yên satelîtî û çend radyoyên me hene lê li hember wan bi dehan yên bi zimanên din hene. Em nikarin bi gotinên atîfî xelkê wînin ser rê. Fermo bala xwe bidin malên Kurdên li derve, ji Swêdê bigir ta Australyayê. Bi hezaran Kurd TV'yên satelîtî yên bi zimanên erebî û tirkî xistine malên xwe. Heta li beşên binxetê be zarokên Kurd ji televizyonên tirkî fêr tirkî bûne. Ji bo hejmareke mezin ji Kurmancên li derve, bi taybetî yên bakurî, hejmara peyvên kurdî ku ew pê dizanin nema têr pêdiviya rojane dike, ew nema dikarin bi wan peyvên bi zarokên xwe re têkevin guftûgo. Hinek ji dengbêjên bakurî, ligel fidakariya wan, çakiya amancên wan û ligel xweşbûna deng û mûzîka wan, di bizava strana bi kurdî de zimanên kurdî birîn dikin û heta bi stranine demên par be bi encama telafuzeke bed diherimînin...

Şoreşeke çandî di nav Kurmancan de pêwîst e û dem bi ser ketiye lê ji bo cîhgirtina wê, û ji bo afirandina derfetên birêxistin û berfirehkirina prosyaya fêrkirina zimanê kurdî di nav xelkê de, tevde, plan, xweorganîzekirin, disîplîn, pispor, kadir û ber her tiştî derfetên aborî divên. Ta ku proseya weha cîh negire çî kampanyayên derbarê axaftin, xwendin û nivîsandina bi kurdî de ta radeyeke bilind bi ser nakevin. Nivîsandin, çapkirin, weşandin û belavkirina pirtûkên fêrkirina kurdî divên, pirtûkên bi şeweyeke çak ji aliyê kesên derbarê zimên û pêdagojiyê de têgihîşt; televizyoneke satelîtiye ji bo pêşvejistina pirsên xwe bi zimên û çandê ve girê didin divêt. Hişyarkirin û fêrkirina daniştvanên gundan û bajran divêt. Afirandina çakberhemên hunerî, rewşenbîrî û edebî divên. Berfirehkirina xuset û erfên xwednîne di nav xelkê de divên. Fêrkirina dayan û bavan divêt... Bi kurtî divêt em nexweşiya li holê ji nû ve û li gor şert û mercên dema xwe, û realîteya xwe, bidin ber çav, nexweşiyê baş binasin û bi nav bikin, jê re li dermanên durist bigerin û wan dermanan bi şeweyeke rêk û pêk bi kar wînin. Yan na, nexweşiya li holê bi niwîştan û bi durîştmen atîfî nahêt careserkin.

Dilê xwe li min mehêlin û min bibexşînin, hêjayan !, ger wêneya min raber kirî, ne yeke rengîn bû. Fermo va gotara li jêr bixwênin, gotara ku hêjayê me **Celadet Bedirxan** berî 73 salan nivîsandiye. Ez wê ji bo we xwendevanên birêz wek diyarî pêşkêş dikim:

Şêrîniya zimanê kurdmancî *

Wekê ez gehîstim Bêrûtê roj çû bû ava û sê saet ji şevê derbas bû bûn. Sibetir, berî nivro, ji mêvanxaneyê derketim, min da kûçe û kolanan, û gehîstim meydana Burcê. Dinya germ, ba şil, bihna mirov teng dibû, diçikiha.

Min xwe da ber siha qehwekê, canê xwe divêsihand. Burc meydaneke fireh û drêjkî ye. Di nava wê de parîzekî kiçik lê spehî heye. Bi giya, bihnûn û daran xemilandî ye. Tê re aveke kiçik dibihure û dikeve nav bêrmeke tenik. Erda bêrmê ji kevîrên şexîrî û benevşgon raxistî ye. Rengê avê tê de winda dibe. Pêrm wek zevîyeke benevşîn xuya dike.

Li serê meydanê sê kûçeyên mezin - ji bakur, ji rojhelat û rojava - xelkê bajêr ditînin û Îê dirijênin. Xelk di nav kûçeyan de mîna robaran diherikin. Ev sê robarên ko di meydanê de digehin hev, dibin lehîke boş û xwe didin ber parîzî. Di ber caxên parîzî re pêlên lehîyê dişkên û lehî dibe du bir, birek di ber rastê û birê din di ber çepê parîzî re diherike, heta piştî Serayê, paşê, dilopên lehîyê, ber bi behrê ve, ji hev dikevin û belav dibin.

Xelk di ber min re dibuhirîn. Pîr û ciwan, jin û mêr, dewlemend û belengaz; ji her rêzê, ji her rayî, ji her nijad û milletî. Min ew ji belg, dêm û serçavên wan nas dikirin.

Carinan şefqekî gewr û pehn bi şaşikekî kesk diketin ber; kumekî sor di ser çarîkekê re diqeliqî. Jinikeke zik mezin, wek denekî, gêr dibû û diket piştî keçikeke narîn û bejnzrav.

Ev e, pêxwasek, qaşo bê hemdê xwe destên xwe di ser hêt û navkelên van pîrek û keçikan re digêrîne.

Min canê xwe vêsihandi bû. Rabûm, ketim nav pêlên lehîyê. Ji nişkê ve, ji kolanekê, çend seriyên bi kum û destmal li min der bûn.

- Ne lo!... hê zû ye... ma çîman... dev jê berde... Heso digot... na herê... guh mede...

Qet ne dihat bîra wan ko ez jî bi zmanê wan dizanim, ko ez jî yek ji wan

im. Ji xwe ji min re zilamek divîya bû ko hûrmûrên min hilgire, bibe mêvanxanê. Min deng li yekî kir.

- Xorto, heke vala yî bi min re were. Xortê ko min deng lê kiri bû, ji hevalên xwe veqetiya û da pey min.

Heta ko em gihiştin dikanekê min deyn (deng: ŞBS) ne kir. Li dikanê min cixareyek da wî û me dest bi axaftinê kir.

- Xorto, tu xelkê kû derê yî?

- Ez xulam, ez bedlîsî me.

Lê zmanê wî ne zarê xelkê bedlîsî bû, min got:

- Ma çîre dibêjî ko bedlîsî yî, ji zmanê (mebest zarava/lehce ye: ŞBS) te kifş e ko tu ji dora Mêrdînê yî.

- Belê, xebera te rast e, lê ez eslê xwe dibêjim. Ez bedlîsî me, lê di mihacirîyê de derketim û di dora Mêrdînê de bi xwedî bûme, ber vê yekê...

- Kengê hatiyî Berûtê?

- Ev bû salek û hin, ma ez xulam tu ji kîjan welatî yî?

- Divêt tu jî , ji zmanê min bizanî.

- Gora zmanê te tu ji welatê Botan î, lê di vî bajarî de tu botî nînin.

Pêlekê sekinî. Kifş bû ko difikrî û di bîra xwe de li tişteki digeriha. Di pey re, rabû ser xwe, hat destê min û got:

- Ez xulam, li sûçê min menêre, min aniha tu nas kirî. Ji xwe min bihîsti bû ko yek ji we li Bêrûtê ye. Min dil dikir ez herim ziyareta wî lê min fedî dikir. Xwedê ji min re li hev anî.

- Belê yek ji me li Bêrûtê ye, lê ew ne ez im, ew brayê min e. Ez li Şamê rûdinim.

Di pey re ez û xweyîyê dikanê em ketin bazara kaxeza Hawarê. Ji xwe ji bona kirîna kaxeza Hawarê hati bûm Bêrûtê.

Min şuxlê xwe kuta kiri bû. Kaxez bi rêhesinê dê bihata rêkirin. Tenê kaxeza çermî min ê bi xwe re bibira. Xortê min çermê Hawarê kir piştî xwe û me da rê.

Em çû bûn dikaneke din. Min bi xweyîyê dikanê re xeber dida. Kurdmancê min di kurçikekê de li ser tetikan rûniştî li min dinêrt û dikenî. Min jî bi devkenekê jê re got:

- Xorto, te xêr e, çîre dikenî?

- Xêr e ez xulam, ji kêfa kurdmancîyê, ji kêfa kurdmancîya te dikenim.

Belê li Bêrûtê kurdmanc zehf in. Ji sibê heta êvarê em bi kurdmancî xeber didin. Lê gava ji devê te dibihîzim hêj bêtir kêfa min jê re têt. Ax ez xulam, tu nizanî kurdmancî çiqas şêrîn e.

- Na herê. kurdmancî kengê bûye şêrîn?

- Bi serê te ê ezîz, tu zman wek kurdmancî ne şêrîn e. Ez bi tirkî rind nizamim, lê min ew gelekî bihîstiye. Li Îraqê min erebî û ingilîzî gelek bihîstine. Li Sûrîyê her roj erebî û frensîzî dibihîzim. Ez van datînim ber hev û dibînim ko şêranîya zmanê kurdmancî di tu wan de nîne. Lê çi fêde ew bi kurdmancî nizanin.

-Ma bizanîyana çi dibû?

-Hingî, ji kurdmancîyê pêve bi tu zmanan xeber ne didan .

*Ev gotar di malpera NETKURD de weşiyaye, û li gor daxwaza nivîsevan di vê hejmarê de cih girtiye.

*Ji HAWAR, hejmar 8:1932, hatiye wergirtin/ Çapa nû: Mihemed Bekir/ Amadekirina bo weşandina internêti: Ş. B. Soreklî

*Têbinî: Mîr Celadet Bedirxan ji hemî zimanan hej dikir. Bêyî guman mebesta wî bi berhema li jor ne ew e ku zimanê kurdî ji zimanên din çêtir xuya bike lê ew e ku ji bo her mirovekî zimanê wî yê zikmakî şêrîntirîn ziman e. Di heman demê de hêviya wî her ew bû ku Kurd li zimanê xwe xwedî derkevin û zimanên din ji yên xwe çaktir texmîn nekin: Şahîn B Soreklî).



Çend egerên bo me pêwîst...



Nori Brimo

noribrimo@yahoo.com

Rijêma beesa ya şoven ya Sûriyê, di roja îro de, di nava girava astengî navdewletî zor giran de digevize, û di çarçewa tajanên bermîrinê de, hêdî, hêdî diherife, yanê weke xûya dike, wê di nêzktirîn dem de ewa li ber bapeşka demoqrasiyê, berve dawiya xwe biçê, bi taybetî piştî kuştina Refîq Elherîrî û bi serde jî derçûna çend biryarên giring ji hêla yekîtiya navnetewî de, ew biryarên ku

serkirdayetîya Şamê xistitine bin têlskob û çavdêriya (UN) ê...!?.

Ev heyama siyasî nû, ya ku li Rojhilata Navîn bi lez û pîvayî diqewime, ji bo miletên Sûriyê weke çaterêyekê ye û herweh li nik gelê kurd taybetmendiyêke wê heye, û ewa cihê şad û bexteweriya me tevan e, ji ber ku weke çawa kevnarên me digotin: **çûk li kevirê me ketî ye...!?**, lê belê, ji hêleke dîtir ve jî metirsîna me ew e, ku her ev kedxwaran ber sistbûn û hilweşandinê biçin, ew pirtir çavsooriyên rengerengî di dermafê miletê me de bikar bînin ...!?

Ji ber ku, wisa tê xûyakirin, ku çiqas guvaştina komelgeha navdewletî li ser rijîma Sûriyê pir bibe, ewê jî bixwaze ku Kurdan pirtir biguvêşe ser hev û derdora wan jî bi pîlanên xwe yê erêberestî dorpêç bike, da ku ewa problema kurdî bitepsîne û mafên me yê çarenûsî daqirtî bihêle.

Vêca...di fersendeke wisa dîrokî û vekirî de, dixwazim hindêk rastiyên giring, bi bîr û bawerî û bi şêweyekî birati bînim ziman :

1- **Eger** guhartinên demoqrasî yê rastînî li Sûriyê peyda nebin, tu carî, tu pirsgerêkên girêdayî, çareser nabin, û bi taybetî jî pirsgerêka me ya kurdî...!?.

2- **Eger** hêzên siyasî yên kurdî bi lez li hev nekin û peyva xwe di çarçewa mala kurdî de nekin yek, milletê me wê jihevketî, taramara û bêpar bimîne...!?.

3- **Eger** têkiliyên kurdistanî bi şeweyên biratî di bin siya rêzgirtina her parçeyeki de, bi awayekî demoqrasî birêveneçin...!?,KurdiTsan wê her bimîne bindest û perçekirî .

4- **Eger** Pêwendiyên bi rêk û pêk di navbera biloka netewî ya kurdî li Sûriya û hêzên erebî yên demoqrasî de ,bi awayekî rêkeftî û li gorî hebûna du(2) netewên serke berdewam ne bin ,her wisa pirsra me ya dademend û rewa ,wê bê çare bimîne ...!?.

5- **Eger** em daxwaza Kurd ya siyasî di xom xomê de bihêlin û wê zelal ne kin, û kengî, ku demoqrasî li Sûriya biqewime û çiqas ewa hebe jî ,, lê her dîsan emê di şeva reş de pir çilaskî û bê maf bimînin...!?, yanê di roja îro de daxwaza me, divê bi kêmanî otonomî ji bo herêmên kurdî be, yanê (îdara zatî) be.

6 – **Eger** serkirdayetiya siyasîya kurdî, têkeliyên dostanî yên navdewletî berferreh neke, yanê eger xebat û leбата xwe dernexîne dervayî Sûriyê, wê tu carî di xebata xwe ya netewî de bi ser nekeve .

Bi rastî...zincîra merc û pêdivîyên girîng, di hundirê vê rewşa siyasî ya taybet û nazik de, yên li dû hev tên, pir dirêj e...!?, vêca mixabin şirovekirina wan, bi çend peyvan di gotareke weke vê de, gelek zehmet e, lê di paşerojê de emê her tiştekî berferhtir bêjin .

*Endamê komîta rêzanî ya partîya yekîti ya demoqrata kurdî li Sûriyê – yekîti –

Beyta ser Şêx Şehabedîn



Celîlê Celîl û Dewrêşê Şêx Mûs

(Ji dîroka serhildana Bitlîsê – s.1914)

Di jîyana gelê kurd de, Di jîyana êl û eşîrên kurdan de bûyarên giring timê bûne bingeh ji bona stranên gelêrî, yên mêranîyê, yên şeran û yên dîrokîyê.ji ber ku, li nivîsandîna dîrokê bi destên zana û rewşenbîrên kurdan demeke dirêj gunehbarî bûye, gel salnama dîroka xwe bi xwe şopandye û bi devkî bona duarojê, û silsilên dahatu bi rengên stran û beytkî parsatiye.

Celîlê Celîl

Çawa zimanê kurdî, wisa jî zargotina wî, di bin bandûra rewşa sîyasî, çivakî û çandîye de bêxêr e, îro sehet bi sehet, roj bi roj hêza xwe qels dibe, dihele, dimaşe, ber bi windabûnê diçe. Ji ber wê

jî, gelek stranên dîrokî, yên bi nîrx îdî nayên gotin.

Di meha şibatê, sala 2005 an de, ez li Amedê bûm. Armanca çûyîna min, lêgerîna kelepûra teseufî li nav kurdan bû. Bingehên sûfiya li Kurdîstana bakur hên jîndar in û hinekên ji wanan, niha cîyên zîyaretî ne û xelq timê diçe seredanê wan. Baldarîya min zêde ser civandîna edebyeta teseufî bû.

Min di nav salên dirêj de, ji nav kurdên êzîdî gelek qewl û beytên giranbuha nivîsandîne, yên ku, di bingehên xwe da li ser jîyana sûfiyan bûn, ser mêrên xas û xudênas bûn. Şexsên ku nav û jîyanên wan di teseufîya îslamîyê da jî pir bi qîmet û giranbuha ne: Wek Rebiya Edewî, Ebdulqadir Geylanî, Bazîdê Bastamî, Huseyînê Helac, Dewrêş Edhem, Îbrahîm Edhem, Şêx Mûs û yên mayîn.

Îjar, ji min ra levhat ji devên Dewrêşan beyt û stranên hêja binivîsim. Di nav van beyt û stranên da beytek heye, naveroka wê ne li ser bûyarên

kevn hatiye sêwirandin, min ewa ji devê Dewrêşekî zana û xîretkêş Hecî Şêx Mûs girtî ye. Ew beyta li ser Şêx Şehabedîn e. Dewrêş bi giştî, ji kevnedîrokê dest pê kirîye, wek edet, beyt û stranên xwe ser şexs û bûyarên giring ava kirine. Şerta giring bû ya, ku bûyer bi dîyanetê va girêdayî bû ya, şexs jî wek xudênasekî xas û buhurtî bi jîyan û olperastiya xwe di nav xelqê dorûberê hêjayî pesinandinê (wesifdanê) bûya. Eger ew şert di bingeha beyt û stranada nebûya, Dewrêş dema gerên xwe li gund û zozanan, di rojên eydan da (çejnan) wexta zîyaretkirina xelqê li wan camîyan û li ser goristanên pîroz, ber xelqê nedistiran. Dewrêş ne tenê bi jîyana xwe, xudênasiya xwe ji bona mirîdan bûne mînak, lê belê ewnan bi gerên xwe va jî mînak in. Defik di destên wan da bûn, gund bi gund geryane û propaganda bîrûbawariya terîqeta xwe, û wesfê sûfiyên xwe yên navdar kirine. Dewrêşên kurdan belkî ji Dewrêşên gelên dinê hinekî cuda bûne. Ewanan di rêpêrtûara beyt û stranên xwe da bûyer û dîrokên wisa, di jîyana gelê kurd de giring û dengdayin e, parastine. Wek nimûne em dikarin van li jêr bi navkin “Beyta xanê Çengzêrîn (Beyta Dimdim”, “Beyta Zembîlfiroş”, beyt û helbestên welatparêzî û filosofî, yên helbestvanên Kurd, yên klasîk wek Feqîyê Teyran, Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî û yên mayîn

Beyta ser Şêx Şehbedîn, bi çi hêjatiya xwe li nav Dewrêşên Kurdan çî girtye? Şik tê tune, ku ev beyt li ser zarên dengbêj, Şêx, Melle û Feqeyên Kurdan jî geryaye. Kî ye Şêx Şehabedîn û çi bûyerên giring di jîyana kurdan de, yên ku ji bona vê beytê bûne bingeh, qewimîne.

**** ** ****

Di Salên berî şerê cîhanê yê pêşin de, di nav kurdan de tevgera pir xurt û fireh ji bona azadiya welêt destpê bû bû. Ewa serenserî herêmên Kurdistanê dagirtî bû: Dêrsim, Bitlîs, Dîyarbekir, Cizîra Bota, Hekarî, Xoy, Salmas, Soucbûlax (Mehabad), Behdînan (Barzan, Akre, Amadiyê), Sulêymaniyê û yên mayîn.

Ji ber nîrxandina rola Rusyayê û giringiya wê di çaranûsa Kurdan da, serkêşên tevgerê li rê û mecalan digeryan, ku kanibin peywendiyên hewkariyê bi nuênerên Rusan ra bibestînin. Ji hemuyan ra xuya bû, ku Împêratoriya Osmanî wê zûtir hilweşe, gelên bindest wê serxwebûnên xwe bi destxin. Tevgera kurdan hevgerêdayî ne bû, ewa ji hev qetyayî

bû. Her herêmekê, her serokê Kurdan tev grûpa xwe peywendî û danûstandinên xwe bi berpirsyarên Rusan ra dimeşandin.

Dewleta "Turkiya Ciwan" li Kurdistanê bi vemrandina agirê serhildanê li herêmên Barzan, Sulêymanîyê, Dêrsimê mijûl bû. Herêma Bitlîsê navçeyekî bi kel bû. Di sala 1914 de, çend meh berî destpêka şerê cihanî, li buharê, Kurdên herêma Bitlîsê bi serokatîya Mela Selîm serî rakirin. Evê serhildanê bi carekê va, hemu Kurdên herêmê xiste nav meş û têkariya xwe û lehiya kurdan ber bi bajarê Bitlîsê ve herikî.

Kurdên ji "Turkiya Ciwan" nerazî, çiqas bi kel dest avîtin dar û gopalan, wisa ji pîr zû li ber hêzên leşkerên dewletê şkestin. Gelek serokên serhildanê ketin nav destê hukumetê û ewanan di hundir heftekê an du heftan da bi daraxaca hatin kuştin. Mele Selîm, rêberê serhildanê li konsolosxana Rusiya da li Bitlîsê, li ser bingeha, ku kurd ji ber armancên azdîyê rabibûn ser pîya, ji nûnerên Rusyayê parastina sîyasî xwest û li konsolosxanê bêst rûnişt. Sîyasetmaderên dewletên Ewropa, yên Rusyayê, di mehên nîsanê û gulanê de raporên têr û tijî li ser zulma leşkerên Osmanî li ser kurdên herêma Bitlîsê nivîsandin û di rojnama nûçeyên ser bûyeran û bervedana armancaserhildanê diweşandin. Di van nivîsaran da me navên gunehbarên azadîxwazîyê, yên ku, daraxacê xistine yek bi yek xwendin.

Girtina Şêxên kurdan û kuştinên wan bi hovî, bi taybetî ya Şêx Seîd Elî, ya Şêx Şehbeddîn û yên mayîn di nav Kurdan de zêde deng da û şopeke xûnî di bîranîna Kurdan de hêşt.

Li ser vê qetlê di arşîva Rusiya da belgên balkêş yên van bûyeran ronî dikin, hatine parastin. konsolosê Rusiya li Bitlîsê V.Şîrkov di 1-ê gulanê, sala 1914 de raporek ji wizereta derva re li Pêtrisburgê şandiye û ewî di wir de weha nivîsiye:

"...Di şeva 22-ê ber bi roja 23 ya vê mehê de, di berbanga zû de, ji bo bi cîanîna biryara dadgaha deştî, ya ku ji alîyê Sultan va hati bû morkirin, li bajarê Bitlîsê li bergeha Gyok-Meydanê, serokên serhildana kurdan, yên ku li ser erdê nêzîkî Dîyadinê hati bûn girtin, jîyanên xwe bi daraxacê ji dest dane ev in :Şêx Şehbed-ed-dîn, apê wî Şêx Seyîd Elî, birayê wî Şêx Mehemed Şîrîn, Feqî Xelîl ji gundê Xîrîta, Mela Cindî ji gundê Karcan, Mela Muheydîn ji Gergerê, Elî-aga ji gundê Xîwrîzê, Xurşîd ji gundê Xarosa, Mecît Karcanlî, Şêx Xeyro ji gundê Kumaç û

Memed Kîrîklî ji Bitlîsê.

Di şeva 26-ê ber bi 27-ê sibatê de dîsan çend kesên din li vir jîyanên xwe bi daraxacê ji dest dan wek :Suleyman-axa ji gundê Xaçkan, Selîm Feqî ji gundê Yako û Hecî Mîrxan ji gundê Kumaç.Di dema bi cîanîna kuştare, cîyê daraxac lê bûn, dorûberî wir bi leşkeran hati bû dorpêçkirin, ewanan nedihîştin, ku xelq nêzîk wî cihî bibin,her tenê di berbanga zû de, Bitlîsyan laşên kurdan daliqandî dîtin , û êvarê jî ew laşanan rakirin, û birin binerdkirin.”Piştî van agahdariyan û di dema kuştinên van xoşmêran de, konsolos di rapora xwe da, balê dikşîne ser bûyerekê.Ew bûyera ji bo me, ji bo berhevdana vê nivîsara konsolos bi beyta, ku me li ser Şêx Şehabedîn ji Dewrêş Hecî Şêx Mûs nivîsiye,giring e.Konsolos weha dinivîse:"

Dibêjin, gava ku Şêx Şehabedîn darva dikirin, di wê demê de benê daraxacê, ji ber giraniya govde wî, du yan sê caran qetyaye, lê dîsan Şêx di çaranûsa hevalên xwe de pişikdar bû.

Ez giring dibînim, ku ez bi serda zêde bikim, wekî serkirdar bi êgînî li vî Şêxî digeryan, hema ji bo wê yekê, ku wî berî serîrakirina Kurdan li Bitlîsê 20 adarê, namek ji walîyê Bitlîsêra şandye, li wê berk xwestyê, ku ew kîlera çeka û dayîreyên dewletê tesmîlî(radestî) wî bike, wekî weli û hemû wezîfedarên dewletê ji Bitlîsê derkevin, eger na, di namê da hati bû gotin, ku dema kurd dakevine Bitlîsê “wê zikê walî û yên hemu karmendên Turkan bidirînin û dê wan tîji ka bikin.”Ji belgeyêke din wek birqîya (têlêgrama) konsolosê Rusya li Wanê tê zanîn, ku Şêxê Xîzanê Şêx Şehabedîn di 14-ê (bi hesaba nû28-ê) nîsanê de bi deh çekdarên xwe va, li ser erdê, nêzîkî sînorê Rusyayê, ber Dîyadîne (senceqa Bazîde), bi arranca ku derbazî aliyê Rusyayê bibe, hatiye girtin.Şêx Şehabedîn di nav kurdên wê herêmê de wek Şêxekî rast ,bi rehm, gelekî navdar û hizkirî bû ye, qedrê wî di ser gişkan ra bû ye, xelq bi dil pey gotinê wî çûye. Balkêş e, ku Ermenîyên li ser serhildana Bitlîsê di rojnameyên xwe da her roj dengûbes diweşandin,ewanan navê Şêx Şehabedîn, bi başî bîr tanin.

Ocaxa Şêxê Xîzanê, wek ocaxeke miqerim û bi kiryamet dihat naskirin. Ji wan ra digotin Şêxê g’ews (3).Rapora konsolosê Rusya Şîrkov li ser kuştina Kurdan û nivîsandina ser qetandina kêndira daraxacê ya ku ne tenê carekê, lê du sê cara diqetiya, ev agahiya li ser wê bûyerê pir giring

e û dive em li ser wê rawestin. Li gorî şerîetê û qanûna îslamî, gava ben yan, kêndirê daraxacê biqete, kesê gunehbar, çi xirabî jî kiribe, divê ew azad bibe. Ev tê şirove kirin wekî ev bûyereke, ku bi destê Xwedê pêk tê. Bi bîranîna stranvanên Kurdan, dardakirina Şêx Şehabedîn sê caran diteribe, benê sêdarê sê caran pey hev diqete. Lê hukumdar û leşkerê "Tirkiya Ciwan", rêzê lib vê qanûna şerîetê nagrin û li dawiyê Şêx bi darve dikin. Ev bûyera, helbet ji bîra xelqê musulman tucarî dernayê, ew kiriyara pêpeskirina şerteke şerîetê ye. Ji ber vê bûyerê, şexsê Şêx Şehabedîn heta niha jî di nav gel da wek pîroz tê naskirin û ew beyt ser wî hûnandine, Dewrêş li ser distrên. Birayê wî Mehmed Şîrîn, apê wî Şêx Seyîd Elî û gelek mirovên wî ji darxacê xilas nebûn Navên wan hersêkan di beytên ,ku me nivîsîne de, tên bîranîn.

**** ** ****

Tu bêjî stran ser vê bûyerê cara pêşîne rastî me tê? Na, nerast e. Prof. Ordîxanê Celîl hên li sala 1973 an li bajarê Kok-Yangakê (Herêma Celalabadê, li Qirgîzstanê) ji devê dengbêj Xalîte Şemo straneke taybetî ser Şêx Şehabedîn nivîsiye û ewa di pirtûka xwe de, ya ser stranên Kurdan yên dîrokî di bin navê (1), kirye. Xalîte Şemo li sala 1924 an li Ermenîstanê ji dayka xwe bûye. Di Sala 1937 an de malbata wî sirgûnî Qazaxîstanê kirine. Bi şedetîya Ordîxanê Celîl, çend şaxên vê stranê li destpêka salên 40- î di kovara "Bîrî nû da" çap bûne, M. Emîn Borzaslan perçak ji vê stranê di çapkirina hijmarên kovara "Jîn" de weşandye. Di nivîsara Ordîxanê Celîl da dengbêj bûyera, ku bena daraxacê bin giranya Şêx Şehabêdînda qetîyaye nîne zimên, lê di beyta, ku Dewrêş Hecî Şêx Mûs gotye, ew bûyera gelek bi êşkere tê gotin û gunehbarîya pêpeskirina qanûna şerîetê jî tê de hatiye diyar kirin. Di beytê da dewsa navê Şêx Şehabedîn, bi şaşî navê birayê wî Mehmed Şîrîn tê gotin.

***Roj hilatî şewqê lêda, hewar şêxê min,
Şîrî anîn avêtin darêda, hey wax û li min,
Şêx avêtin bi şîrîteda, hey wax û li min,
Kindir qetya ji cem Xudêda, rabe ronîya min,
Mehmed Şîrîn avêtin têda, hey wax û li min.***

BEYTA ŞÊX ŞEHABEDÎN

Heyla li min, heyla li min, Şêxê min.
Heyla li min, heyla li min, hey wax felekê.
Heyfe Şêx birine xeniqandinê, oy dayê rebenê.

Şêxek rabû ji G'eydayê, hewar "Şêxê min çi gulek rabû ji tekyayê,
hey wax û sed hey wax.
Qumandara têlek dayê, hewar Şêxê min.
Şêx girtin birne serayê, menal û menal.

Çûm Bitlîsê di kortêda, hewar Şêxê min.
Çûm avayê di kortêda, hey wax û limin.
Qışla Romê way di ortê da, hewar Şêxê min.
Darag'acê di devê wê da, hey wax li minê.

Roj hilatî şewqê lêda, hewar Şêxê min.
Şîrît anîn avêtin darêda, hey wax û li min.
Şêx avêtin bi şîrîtêda, hey wax û li min.
Kêndir qetya ji cem Xudê da, rabe ronya min.
Mehmed Şîrîn avêtin têda, hey wax û li min.

Go, hat ser me emrê Xudê, menal û menal.
Reyîsê Bitlîsê xêrê nebîne, hewar Şêxê min.
Go: -Bînin di kindirê da dînin, hey wax û felekê.
Şîrît zirave, Şêxan hilnîna, hey wax û li min.

Çûm Bitlîsê wa bi rêye, hewar Şêxê min.
Çûm avayê wa bi rêye, hey wax û li min.
Koma mirîda pêda têye, hewar Şêxê min.
Destê Şêxan kirin kelmçêye, hey wax û li min.
Berê Şêxan dane serêye, rabe ronya min.
G'îret nema li vê dinyayê, menal û menal.

Çûm Bitlîsê bi sûk û bi dikane, hewar Şêxê min.

Çûm avayê bi sûk û bi dikane, hey wax û li min.
Komser² û polîs li hevdu civyane, hey wax û li min.

Walî Selîm bê îmane, dayê bi reben be.
Rakirî fermana Şêxane, hey wax û li min.
Li me xeniqandin cotê zavane, dayê bi reben be.
Anîn fermana kurdane, hey wax û sed wax.

Çûm Bitlîsê bi darê şîne, hewar Şêxê min.
Çûm avayê bi darê şîne, hey wax û li min.
Dayka g'ews³ tu bilezîne, rabe Şêxê min.
Xurca zêra bi xura hilîne, hey wax û li min.
Hedya ji walî Selîmra bişîne, hewar Şêxê min.
Belkî efuya mala g'ews bîne, hey wax û li min.
Mehmed Şêrîn nexenqîne, hey wax û li min.

Walî Sêlîm xêrê nebîne, hewar şêxê min.
Fermana Şêxan dixuyne, hey wax û li min.
Yasaxê li ber kurdan datîne, hey wax û li min.

Mehmed Şêrîn kag'etê dibîne, rabe Şêxê min.
Gava kag'etê dixwîne, hey wax û li min.
Hêsir di serda dibarîne, hey wax û li min.

Walî Selîm, de tu waha neke, hewar Şêxê min.
Ucax kuyrbîyo, waha neke, hey wax û li min.
Gidî, tu mala xirab neke, hey wax û li min.
Cotê walîya bi darda neke, rabe Şêxê min.
Fermana mala g'ews raneke, hey wax û li min
Dîne Mehmed parçe neke, rabe Şêxê min.
Şerîeta Mehmed betal neke, hey wax û li min.

Çûm Bitlîsê bi dar û tirî, hewar Şêxê min.
Çûm avayê bi dar û tirî, hewar Şêxê min.
Dayka g'ewsan medegirî, hey wax û li min.

Şîn û girî bêfaydeye, rabe Şêxê min.
Ew roja tum li pêşîya meye, menal û menal.

Çûm Bitlîsê bi bend û reze, hewar Şêxê min.
Çûm avayê bi bend û reze, rabe Şêxê min.
Dayka g'ewsa hela bi neçe, rabe Şêxê min.
Li me xeniqandin zavayê teze, hey wax û sed wax.

Hay la li min li vê huryetê, bavê Şêxê min.
Hay la li min li vê dewletê, hey wax û li min.
Dixwezin qanûnê vê huryetê, rabe Şêxê min.
Xeniqandin Şêx ji boy şîrîetê, dayê bi reben be.

Seyîd Elî dibê: "Keko, wa nakin, rabe Şêxê min.
Em huryetê qebûl nakin, hey wax û li min.
Şewqe li ser serê xu qebûl nakin, hey wax û li min.
Dînê Mehmed alçax nakin, hewar Şêxê min.
Şerîeta Mehmed betal nakin, hey wax û li min.

Çûm Bitlîsê gelî di gelî, rabe Şêxê min.
Çûm avayê gelî di gelî, hey wax û li min.
Kul têkevî mala walî, rabe Şêxê min.
Li me xeniqandin cotê welî, hey wax, sed wax.
Şêx Şebedîn, yek Seyîd Elî, hewar Şêxê min.

Şêx Şebedîn, yek Seyîd Elî, hey wax û li min.
Seyîd Elî, tuyî delalî, hewar Şêxê min.
Tu nexweşî pir bêhalî, hey wax û li min.
Li ber şîrîta Romê tu dinalî, menal û menal.

Li me barya bû ax û xalî, hewar Şêxê min.
Ro dihat girtin, dînya bû tarî, hey wax felekê.
G'eyda bê g'ews maye xalî, hey la ez nemînîm.

(Ev nivîsara. ji zarê Dewrêş Hecî Şêx Mûs li Amedê di 10.02.2005 de hatiye wergirtin)

¹Calilov O.C. Stranê kurdaye taîqiyê. Sankt-Pêtêrbûrg, 2003, ruyê 405-406.

² Komser – ji peyva „komîsar“ tê, bi wateya serok, rêberê partyekê, yanê jî hêzeke leşkerî. Di Vir da bi wateya berpirsyarê partya „Ettehad û Eltereqî“ tê kar anîn. Piştî ku ev partîya di sala 1908 an de li Turkiyê hate ser hukum, serkirdayetîya partîyê, hevkarên xwe dişandin hemû wîlayetan, ta ku li wir walî û karmendan têxin bin kontrol û destlatên xwe.

³G'ews – bi wateya: merîyê buhurtî, yê ku, hemû tiştên, li ser erdê û esmîn diqewimin, pê zane, yanê ew pir şehreza ye.



Têliya Qîza Mîrze Axa

Nimûneyeke çêjdar ji wêjeya devkî ya gelê Kurd



Berhevkirin:

Salihê Kevirbiri

salihkeviri@hotmail.com

Bi qasî ku dizanim, li seranserê cîhanê wêjya gel û neteweyan bi qasî ya devkî ya gelê Kurd 'bedewî-delalî'ya qîz û jinê nîne zimên. Bêguman, tenê çend nimûneyên sereke ji zargotina kurdî li zimanên biyanî bîn wergerandin, û nasandina van nimûne-belgeyan bê kirin, dê bê dîtîna ku ji "Hamlet" a William

Sheakspear ne kêmîtir in. Ev çi delaliya jinê ye ku di wan hevokan de tê xuyakirin? Bi rastî jî delalî-xweşikahiyeke bi vî awayî heye? Lav "birûyê releglegî" çawa ne? We keç û qîzên xwedî "Lêvên tenikî kaxetî" li ku dîtine?

"Diranê sîmê hûrê mircanî" tê çi wateyê? "Serê memikan sor in, qoratên memikan spî ne, mîna Qazocaxê Ceryanî ne!" çi tîne bîra we!? Helbet, di van gotinan de wêjeyeke qirase heye. Ne tenê "bedewî"; carinan "karesatekî" sosret, carinan "bextreşiyêke" malkambax, carinan jî "mêrxasiyêke" bêhempa heye.

Her wekî, bi sedan nimûneyên ji wêjeya me ya devkî, kilama ku bi navê "Têlî" an jî "Têliya qîza Mîrze Axa" hatiye naskirin û binavkirin nimûneyê çêjdar e, ku ji devê dengbêj, ango goyendeyan, heta îro hatiye. Mîna bi xwe ev kilam, bi zaravayê kurmancî ji dengbêjên Serhed, Xerzan, Botan û Bîvanê bi guherto (versiyon) yên hemî jî hev xweştir guhdarî kiriye. Hêviya min ew e, ku kilama navborî li seranserê welêt, bi zimanê kurdî û bi zaravayên kurmancî, soranî û zazakî hatibe bilêvkirin. Heger bi vî awayî be kirmancaxêv (zaza) û soranîaxêv ji vê nimûneya 'çak' a wêjeyî haydar in.

Welhasilî kelam! Wekî min eşkere kir, min kilama 'Têlî' di heft salên dawî de, ji devê çend dengbêjan guhdarî kir. Ne şaş bim di salên 1998-

1999an de, min yek ji van guhertoyan di rojnameya *Azadiya Welat* de belav kir. Kilama li jêr ku hûnê niha bixwînin, min ji devê dengbêj Salihê Qubînî, ku ji Herêma Xerzan e, berhev û tomar kir, paşê jî, bêtî ku dest bidim naveroka wê, darêt ser kaxezê!.

Kerem bikin! Hûn û Kilama "*Têliya Qîza Mîrze Axa*" ...

Wey Têlî Têlî Têlî Têlî
Têlî Têlî Têlî Têlî Têlî...
Ezê serê sibê ji xewka şêrîn rabim bêjim Têlî
Bi nava rojê bibêjim Têlî
Bi êvarê, bi saetê, bi deqê, bi saniyê
Ji axîn û kedera dilê xwe re wezê bang bikim
Rabim bibêjim Wey Têlî...
Na na Weleh heya bikeve çavê min kefa vê sabûnê
Wezê bêjim Têlî
Heta li ser singê min bibe çîrîna kefen, ta û derzî
Ezê rabim bibêjim Wey Têlî
Heya li ber piyê min, li ber serê min
Cotikê kêlên kevîran hebe
Wezê bêjim Têlî
Heta li ser singê min peya bin
Cotek "Melekê Muqerem", "Qasidê Xwedê"
Le gava ji min sûala qebrê bikin
Yeqîna we ji Xwedê bê
Ezê cewaba van melekan nadim
Ezê piştî xwe bidim van melekan
Dîsa ezê bêjim Wey Têlî Têlî Têlî Têlî
Le min got; Tu hûr î, boz î, beyaz î,
Xalis î, kihêl î, mûxlis î,
Ne ad û ne îmze li ber navê te ne
Wele li ber dilê min tu kihêl î
Ez vê sibê hatime mala bavê te
Nizanim çima wisa sûretê sor ji min diveêrî
Heft birakê te hene
Heft heb xwişkê min hene

Sedema çavê te yê reş û belek
Ezê ji wan re bikim berdêlî
Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...

Lê heylê zalimê...
Min got Têliya min lê hayê
Bejin bilinda min lê hayê
Bila qeda heftê bela bikeve
Zewacîka dilketinê
Her çar rokê dinyayê
çiqasî malê bavê min zehf be
Bavêjim Banqê Tirkiyayê
Nizanim çima qelenê bavê te dernayê
Îsal beriya heft salan
Min ramûsanek bi tenê
Ji Têliya malik şewitî standiye
Îsal heft salê min qediya ye
Ji xwe re digirim li der û li dinyayê
Ezê rojê pênc ferza destmêj digirim, limêj dikim
Devê xwe dişom bi sabûnê, bi firçê
Ez dikim nakim
Tama ramûsana vê telesê
Ji binê koka diranê minê kursî dernayê
Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...

Lê heylê zalimê...
Min got de rabe Têliya min lê hayê
Sed caran bi min hayê
Vê sibê rabûye vê sibê
Ji derd û kulê dinyayê
Bi tayê Derwê î xwe girê daye
Ji xwe re digere li ser rûkê vê dinyayê
Min got Xaliqo, Rebiyo
Sibê ye ezê diçûm mala Têliya xwe bi mêvanî
Sibe bû diçûm mala Têliya xwe bi mêvanî

Minê li ber qûlikan û pacan
Stû xwar kiriye, ji xwe re kir guhdarî
Min dêhn û bala xwe dayê
Têliya qîza Mîrze Axa
Destê xwe yê terî-tazî ye
Daniya ber serê kalekî heftê û heft salî
Min dît stêrên çavên min hatine xwarê
Mînanî çem û kanî
Min got, Xaliqo Rebiyo
Mîrin ji min re xweştir e gelo ji vî halî
Min dî bilbilekî ji asîmanê heft qatî
Ji ser çok û çengê min danî
Bi min re xeber da
Bi tirkî, bi kurmancî, bi zazakî, bi romanî
Bi çil û çar zimanî
Digot lo lo kuro lawiko marûmo
Mexsed û miradê te çi ye?
Min digot, mexsed û miradê dilê min Têlî ye
Digot, na na weleh qesem dikim bi navê Xwedê
Mexsed û miradê dilê te û Têliyê
Li vê dinyayê nabe
'Cineta Baqî' gelo 'Erê Alî'
Na na weleh kor poşman ez im
Ezê careka dinê dageriyam
Li ber qûlikan û li ber pacan
Minê stû xwar kir, ji xwe re kir guhdarî
Minê dêhn û bala xwe dayê
Têliya qîza Mîrze Axa
Serê xwe rakiriye ji ser cih û ser balgiya
Digot, kuro lawiko, marûmo, vireko
Rûreşo, derewîno
Zozanê Bîngol û Şerefdîn şewitî biewite
Salek û duwanzdeh meh e
Bi ser me de bi çem û bi kanî
Na na weleh em hê heft salî bûn

çardeh û panzdeh salê me bi hev re qediyane
Em ji xwe re digeriyan lawo
Bi qîzanî bi xortanî
Belê kuliya serê zimanê te nexwari bû
Ava reş bi çavê te de nehati bû
Tiliya min bi çavê te re neçû bû
Te rojekê ji nava rojan
Ji heval hogirê dora xwe re bigota
Dilê min di Têliyê de ye
Wê gavê me yê bi destê hev bigirta, birevanda
Bavêta zozanê me yê jorîn e
Na na weleh tu yê ji min re bibûyayî malxwe
Ezê ji te re bibûma bermalî, kebanî
Îro çima tu yê li hal û demê min napirsî
Ezê ketime tora vî kalê heftê û heft salî
Rojê carek mirin ji min re xweştir e ji vî halî

Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...
Lê heylê zalimê...
Ezê aşiq û sewdaliya bejn û bala Têliya xwe me
Va ye bi derwê î min xwe girê daye
Ji xwe re digirim li ser rûkê vê dinyayê
Ez dikim û nakim
Sebr û hewas û qinyata dilê min li vir nayê
Min xwe berda Şamê, Helebê, Himûsê, Hemayê
Hamûdê, Kerkûk û Kerbelayê
Derketime serê Meka Minawer, Kevirê Tûbayê
Hingî erdekî, temîzê miqades bû
Dikim û nakim
Sebr û hewas û qinyata dilê min li wir nayê
Min xwe avêtiye Girê Erefa yê
Ciyê hêvî û dûayê
Na na weleh minê xwe berda şarê Îraqê
Serê kûçe û mehelê vê Bexdayê
Minê dêhn û bala xwe daye

Qîzikek rûnişti ye, li binê dara darçinarê
Sûretê Cizûyê, Yasînê
Mane dike rûpela mîbarik a vê Emayê
Digot lo lo kuro, lawiko, marûmo
çima wisa li min dinêrî
Navê min e, ji min re dibêjin 'Meyremayê'
Belê were di kêleka min de rûnê
Wezê wê gavê deynim Sûretê Cizûyê, Yasînê
Rûpela mîbarik a vê Emayê
Digot, sed û yek salan
Tu di kêleka min de bî
Tu car û tu car mirina malik şewitî
Her çar rokê dinyayê
Li bîra te nayê
Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...

Min got lê lê zalima qîza zaliman
Qesem dikim bi navê Xwedê
Sed û bîst hebê weka te hebin li dinyayê
Neynûkeka Qîza Mîrze Axa pê nayê
Le lê lê zalimê min got bihar e
Bihara me rengîn e
Li ser riya me Zozanê Bîngol e
Nemrûd e, Serhed e, Şerefdîn e
Birek malê bavê Têliya min bar kirine
Danîne li Zozanê Xazovîzo
Li Qûntarê Sîpanê Xelatê danîne
Hespê binê min kihêl e, rewan e
Şopê malê vedigerîne
Min dêhn û bala xwe daye
Sê konî li beriya Jêrî danîne
Ma cotê konê pêşî kes tê tunîne
Min ajote konê navînê
Min bala xwe dayê sê zerî ne
Bi çav û birûyê re ê leglegî ne

Bi dev û lêvên tenikî kaxetî ne
Bi diranê sîmê hûrê gelo mircanîn e
Weleh serê memikên wan sor in
Qoratên memikên wan spî ne
Mîna 'Qazocaxê Ceryanlî' ne
Li ser masên zêrî û zîvî ne
Zincîrên dorên wan xalis û mûxlisên reşadî ne
Belê ji hikmê nivê evan û pê de
Ji xwe re çay û qehwê dikelîne
Ez evdala ya ortê me
Navê wê Têlî ye
Qey mîna ev her duyên din
Jê re bûne kole û xizmetçî ne
Weleh yek jê çay û qehwê dikelîne
Ya din rahiştiye destmalê
Li serê dike bayê bawêşîn e
Weka qaz û qûlingê beriya Jorîn e
Belê salê carekê
Serê xwe li zozanê Bingol û Serhed û Şerefdînê dertîne
Yeşîna we hebe ji Xaliq Rebê alemê
De çiqas jinê çê hene
Temamî qismetê mêrê kotî ne
Wey Têlî Têlî Têlî Têlî...



Hevpeyvîn li gel mamoste M. Nesîp Gültekîn Serokê Enstîtuya zimanê kurdî ya Amedê



Nûnerê Pênûsê

Roj baş Mamoste! Va ye kovara **Pênûs** li deriyê we dide. Gelo hûn riya pêşewaziyê jê re vedikin?. Eger hûn erê dikin, ji kerema xwe **enstîtuya zimanê kurdî** li Amedê bi xwendevanên me bidin nasîn. Hizra (Fikra) damezirandina wê çawa û kînga li ba we peyda bû?. Kînga we ew damezirand?.

M. N. Gültekîn: Kî ku li deriyê me bide û silavê li me bike, em dibêjin; ser seran ser çavan. Ji bo we jî bi heman awayî dibêjin; ser seran ser çavan. Ku em pirsên we bibersivînin; Enstîtuya Zimanê Kurdî Ya Amedê ev du sal in ava ye. Navenda saziya me li Amedê ye. Beriya her tiştî ev pediviyêke bingehîn bû. Sih salên dawî têkoşînek gewre hate meşandin, gelek ked hat dayîn. Rewş guherî, di hêla zimên de jî gelek pêşveçûn pêk hatin.

Diviyabû ku kar û xebatên zimên ê din bi awayekî rêkûpêk bên meşandin. Ev jî bi riya saziyan pêkan bû. Dîsa diviyabû ku ev sazî ne li Ewropa û metropolan, li kurdistanê li nav gelê kurd be, ango li ser çaviya xwe be. Xebatên şexsî û amator ji demê re nedibûn bersiv. Mijara me zimanê neteweyekê ye. Ev ziman dê çawa bê parastin, hînîkirin û ji nû ve di nav gel de bê belavîkirin? Pirsê sereke ev bû. Ji ber vê pêdiviyê enstîtu hate damezirandin.

Rêveberiya enstîtuyê ji pênc (5) kesan pêk tê. Ebubekir ÇELEBÎ (karê dîplomasiyê), Fevzi ŞENOL (sekreter), Bahri BİRTANE (karê aboriyê), Semra ÖZBEY (karê weşanê). Ji bilî vê jî senatoya me heye û ji bîst (20) kesan pêk tê. Du beşên xebatê hene. Beşê zimên û beşê wêje. Xebat li ser van beşan dimeşe. Ji pêncî kesî zêdetir endamên me hene. Kesên ku bi zimanê kurdî berhem dane, an jî bi dildarî li ser zimanê kurdî dixebitin em wek endam dipejirînin. Gelek endamên me jî xwedî berhem in.

PÊNÛS: Gava we dest bi damezirandinê kir, gelo hûn Pêrgî aloziyan



bûn yan na?. Eger alozî hebûn, ew çi bûn, û we çawa çareser kirin?. Ji hêla din, "Enstîtuy zimên" navekî mezin û balkêş e, lê gava ev sazî dibe a **zimanê kurdî** balkêştir dibe, nemaze jî di hundir van dewletên, ku hîna hebûna Kurdan napejirînin de. Lewre mirov dipirse; gelo helwesta dewletê li hember

damezirandina vê enstîtuyê çawa bû?. Serêşî ji we re pey dakir yan na?.

M. N. Gûltekîn: Gelo pêkan e ku mirov ji bo zimanê kurdî saziyekê ava bike û pêrgî aloziyan nebe? Alozi her berdewam in. Ji destpêkê û heta niha me gelek çaran, ji gelek sazî û dezgeyên dewletê yê têkildar re daxwazname şand, rû bi rû hevdîtîna pêk anîn, da ku bi awayekî fermî em saziya xwe damezirînin. Mixabin, daxwazên me her tim bi neyînî hatin bersivandin û heta niha jî me tu

encam bi dest nexistiye. Rayedarên dewletê wek gotina paşîn ji me re wiha gotin; hûn dikarin wan xebatên ku daxwaz dikin bimeşînin, lê bi awayekî fermî na. Mirov dikare vê helwestê wiha şirove bike; tu heyî, zimanê te jî heye daxwazên te heq in, dîsa jî ez te napejirînim. Kî nî û kurt; dilê min di tunekirin û bişaftina te de heye, tu di wê rewşê de be da ku ez kîngê bixwazim bikaribim te ji holê rakim. Ji ber ku sazî fermî nîn e, nikare hin peywirên xwe bîne cih û xebatên xwe bi hêsayî bimeşîne. Ev yek ji bo me astengî û alozî ye.

Çareserî? Bi çi awayî dibe bila bibe em ê xebatên xwe bimeşînin. Bê şik û guman ev wiha ye. Niha ji bilî vê rê nîn e. Em nikarin bibêjin; de waye dewlet rê nade, em li mala xwe rûnên. Na! Ev mafê min ê xwezayî ye. Ez ê vî mafê xwe bixebitînim. Ji viya rewatir tiştêk nîn e. Ji xwe ev du sal in em bi vê ferasetê tevdigerin.

Aloziyên wekî din jî hene. Ji ber nebûna derfetan û pêkutiyên dewletê kadroyên gihîştî kêm in. Ji xebata saziyan re pispor divin. Ya din jî; di nav me kurdan de hişmendiyek heye 'ku her tişt bi dilê min be ez ê di vê

riyê de bimeşim an na... 'Ka ava bikin ku bû ez ê jî werim ku nebû...'. Ê bavê min ku bû û çû serî ez ê çî bikim ji te. Bi gotineke din; bi qasî ku dewlet astengiyan ji me re derdixe, ewqas jî em ji xwe re derdixin. Li vir em çareserîya vê jî bibêjin; divê sazî kadro û pisporên xwe bixwe bigihîjine.

PÊNÛS: Tê gotin, ku sernavê tiştan gelek rûdawên wan tiştan diyar dike, lewre mirov ji navê "**Enstîtu ya zimanê kurdî**" têdigihîne, ku ev sazî dê xebatên zimanewanî di eniya erkên xwe de deyne. Hûn dikarin, ji kerema xwe, erk û armancên vê saziyê ji me re diyar bikin?!

M. N. Gûltekin: Me erk û armancên xwe di rêznameya xwe de bi awayekî berfireh rêz kirine. Bi kinasî em wiha bibêjin:

Armanca sereke, parastina zimên e. Ango rêgirtin li ber bişavtin û xerakirina zimên. Em tev dizanin ku di vê hêlê de xetereyên mezin li pêşiya me ne. Ji bo vê yekê têgihîştin, şiyarî û zelaliya hiş pêwîst e. Em dixwazin bi riya semîner, panel, xebatên atolyeyî, bulten, û weşanên curbecur bigihîjin vê armancê.

Armanceke me ya din; berhevkirina berhemên wêjeya devkî (zargotin) ye. Em dixwazin van nirxên çanda xwe di arşîvekê de bigihînin hev û biparêzin. Wek pirtûk biweşînin û bigihîjin ber destê kesên xwenda. Bi vî awayî van nirxên xwe jî tunebûnê rizgar bikin.

Amadekirina ferhengên bi her awayî, ansîklopedî, avakirina dezgehan ji bo van xebatan (wek pirtûkxane), gihîştandina pispor û mamosteyan, di bin banê enstîtuyê de, komkirina dildarên zimanê kurdî jî di nav armancên me de cih digirin.

PÊNÛS: Ta îro we çî kar kiriye?. Pîlana we ji bo duwarojê çî ye?.

M. N. Gûltekin: Heta îro me li ser ziman panel û semîner û atolye li dar xistine, bi navê ZIMAN bultenekê diweşînin, sê pirtûk weşandine. Konferansa Standartkirina Zimanê Kurdî di 17-18'ê Sermaweza 2005'an de hate li dar xistin. Ev konferans bi hevkarîya şaredariya Amedê hate pê. Teblîxnameyên ku hatine pêşkêşkirin di demek nêzîk de dê wek pirtûk bînin weşandin. Ku hikûmeta kurdistanê biryarê bide ev konferans di demek pêş de dê hîn firehtir li hewlêrê li dar bikebe (ya Amedê amadehî bû). Saziya me û Korî Zanyar (başûr) bi hev re vî karî dimeşînin. Bernameya konferansê wiha bû:

17.11.2005 Penşem

DESTPÊK:

Ebubekir Çelebî
Nesip Gultekin
Osman Baydemir

DÎWAN

Îzzedîn Mustafa Resul
Deham Abdulfettah
Samî Tan

BABETAN

- 1- Rola Perwerdeyê Di Avakirina Zimanekî Standart de. (Pirs û bersiv).
Dr. Newzat Osman – Serokê Beşê Kurdî. Zankoya Duhok.
- 2 – Di afirandina standartên zimanê kurdî de rê û rêgezên dê werin şopandin. Pirs û bersiv.
Dr. Husên Xaliqî – Enstîtuya Kurdî Ya Stockholmê.
- 3 – Rewşa perwerdeya kurdî ya îro û pirsgerêkên wê. (Pirs û bersiv.)
Dr. Remziya Sabir - Zanîngeha Duhok.
- 4 –Girîngiya alfabe û gramera Yekgirtî ji bo Ragihandinê. (Pirs û bersiv)
Dr. Dilşad Ali– Zanîngeha Silêmanî.
- 5 – Pêvajoya Standardkirina Hin Zimanan û Fêrkariya Metodolojiya Kurdî. (Pirs û bersiv).
Reşîd Kurmanc- Zanîngeha Sine.

18.11.2005 În:

- 6 - Şert û Mercên Standardbûna Zimanê Kurdî Yê Nivîsîn heye-neye ?. (Pirs û bersiv).
Samî Tan- Enstîtuya Kurdî Ya Stenbolê .
- 7 – Di netewebûnê de girîngiya zimanê standart. Pirs û bersiv.
Dr. Îzzedîn Mustafa Resul- Serokê Yekîtî Nûserên Kurd.
- 8 - Pêşdaçûna zimanê kurdî li Behdînan û heremên Kurdan li Turkiye. (Pirs û bersiv).
Dr. Fadil Emer(Nûser) – Adar Jiyan(Nûser).

9 – Kurtedîroka perwerdeya kurdî û alfabe-yên di zimanê kurdî de hatine bikaranîn. (Pirs û bersiv)

Doç. Dr. Qadrî Mamoste – Zanîngeha Dîcleyê ya Diyarbekirê.

(Pirs û bersiv).

10 - Derheqê mabest û babetan de fikr û ramanên delegeyan.

Xebatên me yên ji bo zimên her berdewam in. Projeyê me ya din jî li ser berhemên zargotîne ye. Em û Enstîtuya Kelepora Kurdî (li Silêmaniyê) bi hev re van berheman dê biweşînin. Em bi serê xwe jî van xebatan dikin.



PÊNÛS: Xwendevanên zimanê kurdî, nemaze li bakurê Kurdistanê, gelekî kêma in. Evê yekê çî bandûra neyînî li ser xebata enstîtuyê hêştîye?. We çî çareserî ji vê yekê re dîtîye?.

M.N.Gûltekin:

Kêmbûna xwendevanên zimanê kurdî tê zanîn, û aloziyeke gelemperî ye. Ji

ber ku pergala perwerdehiyê ya zimanê kurdî nîn e, ev rewş dertê holê. Hinek sersarî, rihetiya can û biyanîbûnê jî bidî ser, dê rewş baş bê famkirin. Çareserî jî rakirina vê rewşê ji holê ye. Dîsa sivikbûna zimanê weşanê, erzaniya pirtûk û weşanên din, belavkirineke bi rêkûpêk û hwd jî divê bîn hejmartin. Ger na, xwendevan ji xwe ber zêde nabin.

PÊNÛS: Saziyê, ku di bin vî navî de dixebite, gelek karînen diravî û zanistî jê re divên. Aya we piştgir û alîkarên diravî hene, an endamên birêvebir vî barî hildigrin?. We çî dijwarî di riya peydakirina xebatkarên zanistî de dîtin?.

M. N. Gûltekin: Weke ku tê zanîn enstîtu ne saziyên aborî ne. Divê ji bo wan derfetin bîn destnîşankirin. Tu derfetên amade nîn in, em bi alîkariya endamên xwe debara xwe dikin. Ev jî têrî projeyan nake. Aborî ji bo saziyên kurdan her pirsgirêk e.

PÊNÛS: Li guhên me ketiye, ku hûn berhemên wêje çap dikin. Çawa ev berhemên dikevin destên we, û çawa tên nirxandin?. Mafê çend çapan ji enstîtuyê re ye; ango piştî, ku hûn berhemekê carekê çap dikin, nivîsevan maf heye ji xwe re careke din çap bike, yan na?. Hûn çi dijwariyan di ber belavkirina wan berhemên de dibînin?.

M. N. Gûltekîn: Bi rastî me berê biryar stendibû ku em ê berhemên wêjeyî neweşînin, ji ber ku ev kar karê weşanxaneyan e û em enstîtu ne, ne weşanxane. Lê derfetek derket pêşîya me, me got em wê derfetê bixebitînin. Bi piştgiriya şaredariya Amedê me yê pênc pirtûk biweşandana. Lê nebû, ev kar neçû serî. Li hember wan kesên ku berhemên xwe şandin em ketin şermê. Ya din; berhemên li ser zimên û lêkolînerî ji niha û şûnde jî li gor derfetên xwe em ê biweşînin.

PÊNÛS: Mamoste!. Kovara PÊNÛS sipasdarê we ye, û serkeftinê di karê we de, ji bo we hêvî dike.

M. N. Gûltekîn: Em jî weha serkeftinê ji bo we û ji bo hemî xebatkarên peyv û çanda kurdî hêvî dikin.



Rostem II

Socin û prym



Tipguhastin:
Can Kurd

Go carek ji cara, rehmêt li dêy babê gohdara, go wekî ji nû roja Rostem bû, mezin bû, bî (*bû*) xortê lav (*law*), çû nig

babê xwe, go: “**Babo, hespeg(k) bide min dez (da ez) lê suwar bim.**”

Gotê: “**Kurê min, de here tewîlê, hezar û du**

menegî wê li tewîlê da, bo xwe êkî jê bigre.”

Çû bo xwe êkî ji hemiya girt, îna derê, tazenaze ji tozê weşand, ebayê xwe avête ser piştê, destê xwe avêt ser piştê wî dê suwar bid. Wekî destî xwe avêt ser piştê wî, piştê wî şikest.

Go: “**Eve çawane? Mi ji hezar û du menegî êg (*êk*) bijart, min destê xwe deyna ser piştê, piştê wî şikest. Vê carê ez dê bi rêzê kihêla çim (*biçim*), heçî destê min hilgirt dê min jig (*jî*) hilgirt.**”

Çû li ber rêzê, sekinî, heçî destê xwe deyna ser piştê, piştê wî şikest. Pênsed êxistin erdê. Mehterçî hat pêşiya wî, go: “**Yaman û dexîl ya Rostem, te Îran mie’zel kir, eve kêr te nayin, sebrê (*bi sebrê*) xwe ragire belkî Rebbê a’lemê hespeg(k) bidit te, da tu lê suwar bibî.**”

Rostem lav e hayj (*haj*) dinyaê nîne. Çû mal. Sê çar roja navbênê çû(*n*), şevê hat mal nivist ti (*di*) xew çû, milyaketek hat li ser wî sekînî, gotê: «**Ya Rostem, Rebbî a'lemê hespeg(k) wî ştere** (*ji te re*) **xuliqî, heker ew pê te ji erdê ranakit, çu dewar li ser dinyaê nînin da tu lê suwar bibî** (*bivî*).»

Wekî rabû ser xwe Rostem fikirî şev e, careg(*k*) dî nivist, wekî ti (*di*) xew çû, milyakat hate ser, gotê Rostem:»Rabe ser xwe, carek il (*li*) fecra subehê da here ber gevenda behrê, ji xwe re çalekî bikole, hindeg(*k*) qelaşî (*qirş û pelaş*) bavêje ser xwe û rûne bi (*li*) wê derê. Gavekê tu dê fikirî mehîneg(*k*) dê derkevit ji wê behrê, destê xwe ne avêje wê mehîne, bila biçit ji xwe re biçêrit, tu ji cihê xwe nelive, pajî (*paşî*) wî bihnekî pêl dê kevîm (*kevin*) behrê, behir dibit du qat, hespek dê ji nav derkevit, ew hespe çawan e, belek e mînayê pilingan e, punyek sohr e (*sor e*), punyek spî ye, punyeg(*k*) reş e. Wekî te dîd derket, tu navê xwe û navê babê xwe jê re bêje, hesp pi (*bi*) xwe dê êt li ber te sekînit.»

Rostem ji hindav da rabû. Wekî rabû fetkirî (*hêj*) şev e.

Go: «**Babo, ev e xewn e.**» Careg(*k*) dî nivist hêj ew şev e ti (*di*) xew çû. Gava di xew çû milyaket hate ser, go:»**Rostem rabe ser xwe, eve ne xewn e, ez qesûdê** (*resûlê*) **Allah tea'la ne** (*me*).»

Rostem rabû [*Di vir da jî: qelûna xwe dagirt...*] xew lê heram bû, qelûnê xwe dagirt, qelûna xwe kêşa, wekî fikirî dinya zelal bû,

her rabû ser xwe, ji bajêrî derket, ew ber guvanda (*gevenda*) behrê (*çû*), çalik (*çalikek*) bo xwe kola, pûş û pelaş avête ser xwe. Dinya zelal bû, tav derket, fekirî behir bû şeq, mehîneg(k) jê derket, mala babê mehîne Xwedê ava bikit, hêg li ser piştta wî (*wê*) disekinit. God (*got*): **“Hema eve ye.”** Her rabû destê xwe avêt stoyê mehîne û girt. Wekî mehîne tê fekirî eve însan e, rabû ser paşya xwe, herdu destê xwe avêtin ser herdu milên Rostem. Rostem fekirî, go: **“Ev mehîne vêd şerî dikit (*bikit*).”** Destê xwe avêt neftanga (*navtenga*) mehîne şidand, avête erdê, her çar pê wî (*wê*) kirin zikê wî (*wê*) da, kire kormig(k), avêd(t) wê derê, çû dîsa çalka xwe da rûnişt, gavek tê fekirî pêlêd behrê bilind bû(n), behir bû du şeq. Reqşê (*Rexşê*) Belek derket, her ji hindav da rabû, navê xwe û navê babê xwe ne îna, hema destê xwe avêt stoyê hespê girt. Hesp tê fekirî eve insan e, her rabû ser xwe herdu destê xwe avêt(in) ser milê Rostem, Rostem jî destê xwe avêtin neftanga wî, bî (*bû*) xirenî xavan, şereg(k) xweş kir. Rostem neşya li hespê (*hespê li*) erdê bidit, ew subehî bî (*bû*) heta nîro dagereha.

Rostem got: **“Ya Rebbî nimêja nîvro li min çû, nimêja êvarî li min neçit.”** Got: **“Ez Rostemê Zalê bim.”** Wekî got: **“Ez Rostemê Zalê bim.”** Hespê herdu destê xwe ji ser milê Rostem hilînand, deynan erdê.

Gotê: "Ya Rostem, wekî te navê xwe û navê babê xwe sae'ta ewwil te bo min gotibiya, wê gavê ez dê derkevim, ez dê li ber te sekinim, çinku Rebbê a'lemê eştere (*ez ji te re*) xulqat kirîme."

Go: "Pa min nezanî." Rabû pijbînka xwe vekir, avête stoyê Rexşî, kêşa, miqdarekî hatin, Rebbê a'lemê ziman da Rexşê Belek.

Rexşê gote Rostem, go: "Çu dibêjî ya Reksê Belek?."

Îna gotê: "Miradek te li dilê min da hêla." Go: "Çu Mirada min dilê te hêla?."

Go: "Eva ha diya min bû, an te qenc kuştî biya (*bûya*) an te sax kirî bûya, hindî u'mrê me î dê bi devê xwe çerî bûya."

Go: "Heke min izin şte (*ji te*) hebit ya Reksê Belek ez diçim şe kim."

Îna gotê: "Ya Rostem ne tu Rostemê Zalê bû, rebbê a'lemê ez vê bo te xulqat kirî, heke ne ji fihêta dinyaê biya, ez dê pi(*bi*) xwe heme, dê li dûv da êm, bîsta min berde û here sax bike."

Rostem Reqşê (*Rexşê*) berda, hat qotiya nijdeyî, edarê dermanê sea'd vê têda. Her wê gavê îna (*înan*) derê, dest û pê mehîne ji zikî kêşa, zikê mehîne dirû(t), dermanê sea'dê avêtê, li ser sekinî heta sae't tamam bû, mehîn sax bû, rabû ser xwe.

Rexşê gazî kirî: "Dayê." Go: "Here ez û tu jig (*ji*) xelaz bûn, here

ew meskenê min di (li) behrê da ew jig (jî) bo te, meskenê te jig (jî) bo te."

Mehîn çû xwe avêd (avêt) behrê da. Rostem hat Reşxê xwe kêşa, hate mal, Reşxê xwe girêda, çû nig babê xwe, go: "Babo!"

Go: " Çu dibêjî bab xulam!." .

Got: " Me divêt tu jineg (*jinek*) bidî min daz (*da ez*) il (*li*) hespê xwe bikim."

Go: " Kurê min de here menzila jina, ji xwe re jinek bibijêre û bîne li hespê xwe bike."

Rostem çû menzila jina, ji hezar û du jina wî êg (*êk*) bo xwe jê girt, îna derê, danî ser pişta hespê. Heç wekî hêkekî, tu (*çû*) deyna ser pişta hepek (*hespê*) Reşxê Belek tematî çiyayî Cûdî tê heye, zîn avêt kur babê xudanî, çû nig babê xwe.

Go: " Babo."

Go: " çi dibêjî?."

Go: " Jinek bide min daz (*da ez*) il (*li*) hespê xwe bikim."

Go: " Kurê min, ma tu ne çuyî menzila jina?»

Go: Belê babo, ez çûm, min jinek îna derê, kêr hespê min ne hat.»

Go: " Kurê min, ma hespê te şêderê e (*ji kê derê ye*)?"

Go: " Babo, hespê min behrî ye."

Go: "De here, babê bapîrkê te ew jî hespê wî behrî bû. Ew jî fêrîsekî bi xedar bû, zînê wî û çekê wî û dawedozê wî hemû wê li

menzila heye. Here bîne derê.”

Wekî çû fekirî çiyê, go: “Li wê derê deynandî.”

Destê xwe avêtê, derêxist, dawêşand tazenaze danî ser pişta Reکشê Belek. Wekî tu (çû) fekirî subhanê ji ezemeta Xwedê, serrac (Zînkâr) ew zîna bo pişta wî Reکشî çekiriye. Zîn ser pişta Reکشê Belek danî, rikêb teniştê ve kirin. Tang û baletangê wî şidandin, hesp hêla li wê derê.

Go: “ Babo, destek çek bide min.”

Go: “ Kurê min, de here ew menzila ha, derî veke, çekê bapîrkê te Samê Nelima, here bo xwe bîne derê.”

Çû dergah vekir, çekê bapîrkê xwe înan derê, deynan li wê derê, çû gurzê bapîrkê xwe înan (îna) derê taze naze îna, hespê xwe mexes û gulweşîn kir, zîne merose ser piştê rakita, rikêbêd aldozî (yaldozî) teniştê ve kirin, ligavê zêrî da ser, tang û baletangê xwe şidand, wekî Rostem bejn û balayê xwe fekirî, hef (heft) zêrî kumzerî wergirt, mitalê pîlayî kêşa milê xwe, înan qeşerî avête hefka xwe, kevana yangî avête milê xwe, almasê hindî avête pişta xwe, qebûra tîra ber pişta xwe ra kir, gustîra xîretê avête tîla xwe, bazbendê fethî avête pîlê xwe, qotiya nijdeyî ader avête di alganî da, destê xwe avêt gurzê giran, hezar û êk xûnkarî bi destê rastê hilgirt, destê çepê da ber, xela ketine arda, çirîkên (jirîkên) çû bî (bû) esmana, milyekate lingê xwe ji ber hilkêşa,

behir hate leqiyane, adir hate hejane, barane emri le barî, xût (h'ût) û nehing serê xwe ji behrê derani, melekê ruha le tifeqi, bayê Nîsanê di goha (*guha*) werbû (*lêda*), toz û ecac le girti serêd kêriya, Rostem pê (*pêyê*) xwe rikêbê da îna, ji textê Iranê derket, meydanekê Rexşê Beleg(*k*) da, ji aqarê Îranê derket, li aqarê Tûraniya, nêçira xwe kir. Gavekê tê fikirî, kafireg(*k*) ji wê ve hat, go: **"Vayî gidî kafirî mizawêr."**

Go: **"Hedê te û babê te ye û pi (bi) ser aqarê me nêçir û rave bikî?"**

Îna gotê: **"Gidî ma tu kêrey (*kûrî*), tu Rexşê Rostem nasnakî?"**

Go: **"Ma tuyî Rostem?"**

Gotê: **"Herê ezim Rostem."**

Kafirê(*i*) gote Rostem: **"Derbê xwe deyne, heker (*heke*) nexwe, ruha te hinda."**

Rostem gote kafirî mizawer: **"Ew ne qewlê me sahib qeranî ye, em berê derbê xwe deynin, de derbê xwe deyne, heker te ez kuştim da ez bi îmam bim, heker te ez ne kuştim, da ez wecekê bi Keyxîra paşa li ser textê Îranê bigerim."**

Wekî Rostem wa gote, kafir enêrî, rabû ser rikêba, go: **"Bi nar û nûr, bi lat û toza bi dêr."** Maleşeng hilavête ber perêd esmana, zurazur ji xilakê di gurzî hatin. Ev gurza hate Rostemê (*Rostemî*). Rostem zêrî û kumzerî kêşa ser xwe. Mertalê pîlayî da ber, ev

gurza jor da hat bi tasa mitalê pîlay ket, gurz vebehî bi erdê ket. Bayê Nîsanê lêda, toz û e'jaj safî bû. Kafirî gote Rostem: “ **Ma hêş (hêj) tu mayî?.**”

Rostem gotê:“**Ma mirî ji mala babê te mirî bûn? Te ev toz û e'jaja bi me werkir.**”

Wekî Rostem rabû ser rikêbe, gurza maleşeng hilavête ber perêd esmana, xelekê di gurza heç wekî kuçka dirawin (*dirabin*). Paloxtên agirî pi (*bi*) ser kafirî da hatin, Allahû Agber (*Ekber*), li gurzî hingaft, ji qewlê Şahname jê dibêjit kafir ji gergedanî avête xwarê. Rostem pê xwe ji rikêbê îna derê, elmasê hindî avête stoyê wî kafirî, pêlêd xwînê li ser êg du ta bûn, Şahname jê dibêjit wekî hefd (*heft*) aş hebûna dê li pêla xwîna wî kafirî digerin heta xwîna wî kafirî betal bû. Rostem il (*li*) ser pêya bû, herdu gohêd wî kafirî jêkirin, danîn ser pişta Reqşê. Rostem vegera hate mal. Îranî hatin pêjve (*pêş ve*), xeza lê pîroz kir(*in*), zêr li ser serê wî reşandin. Rostem guhik bir dîwana Keyxusra paşa. Pazde fêris rûniştin ser, qasî mexfûreg(*k*) ji ber wan zêde bû.

* Beşê yekem, yê vê nivîsarê di hejmara 18ê de belav bûye. Ev gotar, weke, ku ji me re hatiye, me derbasî kovarê kiriye, bê ku em destbidin rênivîs û rêzimana wê, da ku ew weke jêdereke ji bo vekolînên zimanê me re bimîne.



Lêker di zimanê kurdî de



Dr. Hussein Habasch
abasch@gmx.de

*E*v benda min ji bo mamosteyên zimanê kurdî li NRW amade kir û min ewa di rojên 15./16. 11.2003 û di 24.4.2004 an de li bajarê Gelsenkirchen (Elmaniya) xwand. Zimanzanên kurdî, yên ne rûsizan mixabin nikarin sudê ji destketinên zanistî, yên li Soviyetistanê bûne, werbigirin; loma jî bi karneanîna wan jêderan, karên wan hinekê qels dibin. **Jêderên serekîn di vê lêkolîna me de de, jî bilî klasîkên Bedîrxaniyan; Celadet û Kamêran Bedîrxan, berhemên wan in.**

Lêker, bêjeyek e, di demekê de, bûyerekê, rûdanekê numa dike.

Di kurdî de sê cûreyên lêkeran hene:

1. Lêkerên sade.
2. Lêkerên hevedudanî (lêkdayî, complex).
3. Bêjeyên Lêkerî (Wendung, Phrasa) hene.

1. Radera (jêder, Havik, Infinitiv, mesder) lêkerên sade ji bingeha (ra, binyad) û dawîneyeke lêkerî peyda dibe:

Bingeha lêker **Dawîneya lêkerî**

| | |
|------|----|
| Hat | in |
| Ket | in |
| Girt | in |
| Hat | in |
| Xwar | in |

2. Lêkerên hevedudanî bi arîkariya **pêşdanî** (pêşgir, pêşbend, pêşpirt, pêrkît, Präfix), **navdêr, rengdêr û lêkerekî sade** peyda dibin.

Pêşdanî di lêkerên hevedudanî de:

Deranîn (der + anîn), dahatin (da + hatin), hilkirin (hil + kirin), hilkişandin (hil + kişandin), vexwarin (ve-xwarin) û hwd.

Lêkerên hevedudanî yên bi arîkariya navdêr, rengdêr û lêkerekî sade peyda dibin: Sorkirin, (sor + kirin), bazdan (baz + dan), avakirin (ava +

kirin) ûhtd.

3. Bêjeyên lêkerî:

Ew bi saya daçek, cînav (pronav) û lêkerekî hevedudanî saz dibin:

Lêdan (li wî / wê dan), jê hez kirin (ji wî / wê hez kirin), lê sîwar bûn (li wî)wê sîwar bûn) û hwd.

Bingeha lêkeran:

Çawa di zimanên îranî din de, di kurdî de jî- ji bilî haletine awarte — du bingehên lêkaeran serekîne hene:

Bingeha dema borî. (bdb) .

Bingeha dema niha. (bdn) .

Bingeha dema borî (emê ji vir û hada **bdb** binivîsin) bi devjêberdana dawîneya lêkerê peyda dibe, eger berî wê dengdar ya dengdêr be :

Rader (Infinitiv)

bdb

şandin

şand

revîn

revî

Bingeha dema niha (**bdn**) ya lêkerên biservehatî(regelmäßig) ji **bdb** bi van du şeweyên jêr peyda dibin:

1. Eger **bdb** bi dawîneya — **and** temam bibe **bdn** paşaniya - **în** werdigire:

Rader

bdb

bdn

şewitandin

şewitand

şewitîn

kelandin

keland

kelîn

kişandin

kişand

kişîn

vegerandin

vegerand

vegerîn

tirsandin

tirsand

tirsîn

şelandin

şeland

şelîn

hejandin

hejand

hejîn

çêrandin

çêrand

çêrîn (2. 166 — 167)

2. Eger dawîneya **bdb** bi paşneyên - **î**, - **a**, - **îya**, - **îya** temam bibin, ew di **bdn** de dikevin û bdn li ser bingeha xwe dimîne:

Rader

bdb

bdn

xebitîn

xebitî

xebit

birrîn

birrî

birr

hêrran

hêrra

hêrr

| | | |
|-----------|----------|-----------------------------|
| kolan | kola | kol |
| stiran | stira | stir (hevîr sîira, disîirê) |
| gerriyan | gerriya | gerr |
| velezîyan | veleziya | velez |
| çêriyan | çêriya | çêr |
| kenîyan | keniya | ken |

Peydabûna **bdn** di lêkerên nebiservehatî(unregelmäßig) de dijarwar e. Ta **bdn** ji **bdb** bête derxistin,divê pênc formên dengdar û dengdêr bêne nuna kirin:

1. Eger dawîneya **bdb** bi tîpên **st** temam bibe, tîpa **t** jê dikeve û paşê dengê bingehîn **s** dibe **z** :

| <u>Rader</u> | <u>bdb</u> | <u>bdn</u> |
|--------------|------------|------------|
| gestin | gest | gez |
| lîstin | lîst | lîz |
| xwastin | xwast | xwaz |
| guhastin | guhast | guhêz |
| alastin | alast | alêz |

2. Eger dawîneya **bdb** bi tîpên **st** temam bibe, tîpa **t** jê dikeve û tîpa **ş** di **bdn** de carina dimîne û carina jî bi tîpa **j** tê guhartin:

| <u>Rader</u> | <u>bdb</u> | <u>bdn</u> |
|--------------|------------|------------|
| qelaştin | qelaşt | qelêş |
| gihîştin | gihîşt | gihîj |
| kuştin | kuşt | kuj |

3. Eger dawîneya **bdb** bi tîpên **rt** temam bibe, tîpa **t** jê dikeve, lê tîpa **r** di **bdn** dimîne:

| <u>Rader</u> | <u>bdb</u> | <u>bdn</u> |
|--------------|------------|------------|
| veşartin | veşart | veşêr |
| bijartin | bijart | bijêr |
| spartin | spart | spêr |

4. Eger dawîneya **bdb** bi tîpa **t** tamam bibe, ew jê dikeve û tîpa **j** bi ser bingeha **bdn** de zêde dibe:

| <u>Rader</u> | <u>bdb</u> | <u>bdn</u> |
|---------------------|-------------------|----------------------|
| rêtin | rêt | rêj |
| mêtin | mêt | mêj |
| petin | pet | pêj (pêç, bi rûssi) |
| avêtin | avêt | avêj (2. Rûpeê 168) |

5. Eger di nav, yan di dawîneya **bdb** de dengdêra **a** hebe, ew dibe **ê**:

| <u>Rader</u> | <u>bdb</u> | <u>bdn</u> |
|---------------------|-------------------|-------------------------|
| spartin | spart | spêr |
| bijartin | bijart | bijêr |
| veşartin | veşart | veşêr |
| guvaştin | guvaşt | guvêş |
| nixamtin | nixamt | nixêm (têwerdan) |
| kilan | kila | kilê (ajoîn, erd ajoîn) |
| (kêlan | kêla | kêl) |
| stiran | stira | stirê (hevîr disiirê) |

Di van pênc formên binavkirî de haleîne awarteyî jî hene, mîna:

| <u>Rader</u> | <u>bdb</u> | <u>bdn</u> |
|---------------------|-------------------|-------------------|
| ristin | rist | ris |
| şuştin | şuşt | şo |
| rûniştin | rûnişt | rûn |
| firotin | firof | firoş |

Herweha kokine lêkerên lêzêdekirî (sûppleîtv, Suppletiv isî- war) di kurdî de hene, mîna:

| <u>Rader</u> | <u>bdb</u> | <u>bdn</u> |
|---------------------|-------------------|-------------------|
| dîtin | dî(t) | bîn |
| gotin | go(t) | bê(j) |
| çûyîn | çû | ç / her |

Kesandina lêkeran:

Kesandina lêkeran bi dawîneya bingehên lêkeran ve girêdayî ye, eger **dawîne bi tîpên dengdar bêne temam kirin**, wê çaxê ew vê formê werdigirin:

Nivîsîn:

Yekejmar Gejmar
ez *dînivîsim*, tu *dînivîsî*, ew *dînivîse*. em, hûn, ew *dînivîsin*.

Dawîneya kesê 3-ê di yekejmarê de **e** tenê, di dema **niha** û ya **tê** de tê bikaranîn, di demên **borî** de ewnatê bikaranîn (2. 171).

Dawîneya kokên lêkerên bi dengdêran temam dibin:

Heyîn:
Yekejmar Gelejmar
ez *heme*, tu *heyî*, ew *heye*. em, hûn, ew *hene*.

Afirandina lêkeran bi saya pêşdaniyan (Präfix):

Piraniya pêşdaniyan ji daçek yan ji “Posîpositionan” peyda bûne û bi rêya wan lêker û navdêrine nû di zimanê kurdî de tene afirandin.

Di jêderên berdest de ew mijada rind hatiye lêkolandin, tevî wê jî em çend mînanan êi vir numa dikin.

Pêşdanî di kurdî de :

Ba- badan (Azad destê dijminê xwe bada ûgirêda).

Da- pir lêker pê tene afirandin. Danîn, daçikandin, dadan, dagirtin, dabezîn, daketin, daxwaz.

Der- deranîn, derxisîn, derbûn, derdan, derketin...

Hev- hevgirîn, hevcivandin, hevexistin...

Hil- hilanîn, hilaîn, hilfirîn, hilkişîn, hiladan...

Jê- jêkirin (ji wî / wê kirin), jêxwestin, jêderxistin..

Lê- lêdan, lêxisîn, lêwergirîn, lêzanîn...

Pev- pevketin, pevçûn, pevxistin...

Paş- paşdahatin, paşxistin, paşgotin...

Pêş- pêşdanîn, pêşhatin, pêşketin...

Ra- rabûn, radan, ragirtin, rakirin. raxistin...

Rê- rêdan, rêkirin...

Rû- rûniştin, rûdan, rûgirtin, rûveşartin...

Ser- serdan, sergirtin...

Tê- têderxistin, têxistin, têwerdan...

Ve- vebûn, vedan, vegeîn, vejandin, vemirandin, vexwarin...

Wer- wergirtin, werbûn, wergerandin...

Kesandina van lêkerên hevedudanî mîna lêkerên sade ne. Berlêkera **di** dikeve navbera pêşdanî û lêkera sade, mîna: **Vekirin** :

Ez **vedikim**, tu **vedikî**, ew **vedike**, em, hûn, ew **vedikin**.

Di forma neyînî de jî di dema niha de, li şûna berlêkera **di** nişana neyînê **na** dikeve şûnê.

Ez **venakim**, tu **venakî**, ew **venake**, em, hûn, ew **venakin**.

E- Carina dikeve paş lêkeran û bi wê yekê ew nişandana kirinê (Aktion, dêystvîyê) bo lêkerê kesandîyêr dike. (2. 176).

Lêkerên arîkar:

Ew lêker ji bona afirandina deman û cûreyê kirinê tên bi karanîn. Di kurdî de lêkerên alîkarîyê ev in: **Dan, hatin, heyîn, anîn û bûn.**

Forma modêlên deman di lêkerên kurdî de:

Ç. Beko raweya pêşker (Mode indicatif, Indikativ) weha parve dike :

1) Dema niha. 2) Dema tê. 3) Dema boriya sade. 4) Dema berê-niha, Kurdo - boriya dûdar, K.

Bedîrxan – Perfekt. 5) Dema boriya dirêj. 6) Dema boriya çîrokî (Plusquampêrfêkt).

Pisporê lêkerên zimanê kurdî Î. Tsûkêrman di monografiya xwe de ya bi navê „Oçêrkî kurds koygramatikî“ 12-e modêlên demên lêkerên kurdî di rûp. 235-an de dinivîse. Herweha modêlên din jî hene, lê emê li ser yên gelemper rawestî û mînan ji piran wergirin, lê berhema serekîn di amadekirina vê mijarê de ya Ç. Beko ye, me ew vebjart, ji ber ku wî, ew ji dîyalêktên têvel yên Kurdên sovyet amade kiriye.

Dema niha:

Dema niha ji **bdn** peyda dibe bilêzêdekirina berlêkerê **di** di forama erênî de û bi **na** di forma neyînî de.

Kesandina lêkerê nederbaz (intîransitiv):

Ketin:

Ez **dî**kevim, tu **dî**kevî, ew **dî**keve, em, hûn, ew **dî**kevin.

Ez **nake**vim, tu **nake**vî, ew **nake**ve, em, hûn, ew **nake**vin.

Forma dema niha wê maneyê dide, ku kirin (Akîtion) niha dibe, ew demê li ser tê axaftin: **Derva sar e,baran dibare**. Mera dikare wê formê bo demeke dirêj bikarbîne: **Îsal ew pir kar dîkin**,forma dema niha bi awakî fereh di nivîsarên çîrokî de tê bikaranîn, bona ku bi hukardarî bûyer bê,dema niha: **Wexîa Cangîr dikeve ser rêça gura, ew hildikşe ser zinarekî, dorbera xwe dinire, ku çar gur ûdu çêlegur ber bi kendalekî diçin. Ew tivingê ji stûyê xwe derdixe, dibeze pêşiya wan digire ...**,forma dema niha divê ku di hevokên pêvegirêdayîn de (Nebensatz) bêne bi karanîn, piştî wan lêkerên di demên borî de bûne: **Her êvarê, wexta ku ez li mal derdiketim derva, min didît, ku li pêşiya çiyayêŞengalê cî-ciya agir vêdiekve.**

Dema tê:

Dema tê çawa formeke lêkerî di devoka Kurdên li Turkmênistanê dijîn, tune ye (2. 180 -î), lê ew li cihên din yên Kurd lê dijîn, heye.forma peydabûna dema niha bi arîkariya berlêkerê **bi-** û *dawîneyên cînavên kesanî* li **bdn** zêdebin,peyda dibe.

:Ezê bikevim, tuê/yê bikevî, ewê bikeve, emê, hûnê, ewê bikevin.

Dema boriya sade (boriya têdayî. 3. 45)(wextê berê bihirî 5. 192-193), (Präteritum):

Ez **ketim**, tu **ketî**, ew **ketem**, hûn, ew **ketin**.

Ez **ne ketim**, tu **ne ketî**, ew **ne keîem**, hûn, ew **ne ketin**.

Dema boriya dirêj (boriya berdesî3. 45), (wextê berê dirêj, 5. 195-196), (Imperfekî):

Ez **diketim**, tu **diketî**, ew **diket**, em, hûn, ew **diketin**.

Ez **ne diketim**, tu **ne diketî**, ew **ne diket**, em, hûn, ew **ne diketin**.

Dema borî-niha (boriya dûdar 3. 45), (wextê berê-niha, 5. 189-190), (Perfekt):

Ez **ketime**, tu **ketiye/ ketîyî**, ew **ketiye**, em, hûn, ew **keîine**.

Ez **ne ketime**, tu **ne ketiye/ neketîyî**, ew **ne ketiye**, em, hûn, ew **ne ketine**.

Dema boriya çîrokî(3. 45), (wextê berê zûda bihirî 5. 197),

(Plusquamperfekt1. 137):

Ez ketibûm, tu ketibûyî/ ketibiwî, ew ketibû, em, hûn, ew ketibûn.

Ez ne ketibûm, tu ne ketibûyî/ ne ketibiwî, ew ne ketibû, em, hûn, ne ketibûn.

Kesandina lêkerên derbaz (transitiv):

Lêkerên derbaz, ew hewcedariyê bireserekê C. Bedirxan, têrkerekê ne K. Bedirxan.

(Akkusativobjekt). Q. Kurdo hîn wan ferehtir şirove dike: Ji wan lêkeran re dibêjin lêkerên derbaz, ewên ku kirina merivekî, tiştêkî li ser tiştêkî, xebatekê nîşan dikin; ew nîşan dikin ,ku kira kesekî derbazî ser kesekî, tiştêkî din dibe. Di zimanê kurdî de navê ew meriv yan jî ew tişt yê ku îşekî dikin, û kira wan derbazî ser tiştêkî yan merivekî dibin, danîne **kiryar** (kirde, û fêlêkar, Subjekt), lê navê tişt, îş û karê ber kirinê, yê li ser îşekî dikin, danîne **berkiryar** (bireser, têrker, Objekî).

Lêkerên nederbaz ew in, yên bûyîn û qewimandina tiştêkî, yanê ji merivekî nîşan dikin. Ew numa dikin, ku kira merivekî, ya tiştêkî derbazî ser tiştêkî, yan kesekî din nabe, mîna: **Ez diçim, tu ditirsî, hûn digerin, ew rûniştiye.**

Lêkerên derbaz û nederbaz - C. Bedirxan û R. Lêsko - dibêjin: Ku qeyda kesandina wan di demên niha û tê de yek in, lê di demên borî de cuda ne (1. 110).

Lêkerên derbaz û kesandina wan:

Şandin:

bdn

şîn

bdb

şand

pareng (Parîizip).

şandî.

Di demên niha û tê de lêkerên derbaz bi kirde (Subjekt) re hevkar in û di demên borî de ew bi bireserê re hevkar in.

Dema niha:

Biresera yekejimar:

Ez pirtûkê dişînim .Tu pirtûkê dişînî. Ew pirtûkê dişîne. Em, hûn, ew pirtûkê dişînin.

Biresera gelejmar:

Ez pirtûkan dişînim.Tu pirtûkan dişînî.Ew pirtûkan dişîne. Em, hûn, ew pirtûkan dişînin.

Dema tê:

Biresera yekejmar:

Ezê pirtûkê bişînim, tuyê/tuê pirtûkê bişînî, ewê pirtûkê bişîne, emê, hûnê, ewê pirtûkê bişînin.

Biresera gelejmar:

Ezê pirtûkan bişînim, tuyê/tuê pirtûkan bişînî, ewê pirtûkan bişîne, emê, hûnê, ewê pirtûkan bişînin.

Dema boriya sade:

Biresera yekejmar:

Min, te, wî, wê pirtûk şand, me, we, wan pirtûk şand.

Biresera gelejmar:

Min, te, wî, wê pirtûk şandin, me, we, wan pirtûk şandin.

Dema boriya dirêj:

Biresera yekejmar:

Min, te, wî, wê pirtûk dişand, me, we, wan pirtûk dişand.

Biresera gelejmar:

Min, te, wî, wê pirtûk dişandin, me, we, wan pirtûk dişandin.

Dema borî-niha (Perfekt):

Bireser yekejmar:

Min te, wî, wê pirtûk şandiye, me, we, wan pirtûk şandiye.

Biresera gelejmar:

Min, te, wî, wê pirtûk şandine, me, we, wan pirtûk şandine.

Dema boriya çîrokî(Plusquamperfekt):

Biresera yekejmar:

Min, te, wî, wê pirtûk şandibû, me, we, wan pirtûk şandi bû.

Biresera gelejmar:

Min, te, wî, wê pirtûk şanadibûn, me, we, wan pirtûk şandibûn.

Dema niha:

Biresera yekejmar

Ez te dişînim.

Tu min dişînî.

Ew wî dişîne.

biresera gelejmar

Ez we dişînim.

Tu me dişînî.

Ew wan (a) dişîne.

Dema tê:

Biresera yekejmar

Ezê te bişînim.
Tuyê/tuê min bişîni.
Ewê wî/wê bişîne.

Dema boriya sade:

Biresera yekejmar

Te ez şandim.
Min tu şandî.
Wî/wê ew şand.

Dema boriya dirêj:

Biresera yekejmar

Te ez dişandim.
Min tu dişandî.
Wî/wê ew dişand.

Dema boriya-niha:

Biresera yekejmar

te ez şandime.
Min tu şandîyî.
Wî/wê ew şandiye.

Dema boriya çîrokî:

Biresera yekejmar

Te ez şandi bûm.
Min tu şandi bûyî.
Wî/wê ew şandi bû.

Kesnadina lêkera bûn (bûyîn):

bdn

b

bdb

bû.

biresera gelejmar

Ezê we bişînim.
Tuyê/tuê me bişîni.
Ewê wan (a) bişîne.

biresera gelejmar

Te em şandin.
Min hûn şandin.
Wî/wê ew şandin.

biresera gelejmar

Te em dişandin.
Min hûn dişandin.
Wî/wê ew dişandin.

biresera gelejmar

Te em şandine.
Min hûn şandine.
Wî/wê ew şandine.

biresera gelejmar

Te em şandi bûn.

Min hûn şandi bûn.
Wî/wê ew şandi bûn.

Dema niha:

Yekejmar

Ez dibim, tu dibî, ew dibe.

gelejmar

Em, hûn, ew dibin

Dema tê:

Yekejmar

ezê bibim, tuyê/tuê bibî, ewê bibe.

gelejmar

Emê, hûnê, ewê bibin.

Dema boriya sade:

Yekejmar

Ez bûm, tu bûyî, ew bû.

gelejmar

Em, hûn, ew bûn.

Dema boriya dirêj:

Yekejmar

Ez dibûm, tu dibûyî, ew dibû.

gelejmar

Em, hûn, ew dibûn.

Dema borî-niha:

Yekejmar

Ez bûme, tu bûyî, ew bûye.

gelejmar

Em, hûn, ew bûne.

Dema boriya çîrokî:

Yekejmar

Ez bûbûm, tu bûbûyî, ew bûbû.

gelejmar

Em, hûn, ew bûbûn.

Kesandina lêkera heyîn û hebûn:

Lêkera heyînê tenê di dema niha de tê kesandin.

Forma erênî:

Yekejmar

Forma erênî:

Ez heme, tu heyî, ew heye.

Forma neyînî:

Sê forman Q. Kurdo numa dike:

Yekejmar

Ez tune me, tu tune yî, ew tune ye.

Ez ne heme, tu ne heyî, ew ne heye.

Ez nîn im, tu nîn î, ew nîn e.

gelejmar

Em, hûn, ew, hene.

gelejmar

Em, hûn, ew tune ne.

Em, hûn, ew ne hene.

Em, hûn, ew nîn in.

Kesandina lêkera hebûnê:

Lêkera hebûnê di dema tê û di demên borî de tê kesandin.

Dema tê:

Yekejmar

Forma erênî:

Ezê hebim, tuyê/tuê hebî, ewê hebe.

Forma neyînî:

Ezê tune bîm, tuyê/tuê tune bî, ewê tune.

gelejmar

Emê, hûnê, ewê hebin.

Emê, hûnê, ewê îune bin.

Dema boriya sade:

Forma erênî:

Yekejmar

Ez hebûm, tu hebûyî, ew hebû.

Forma neyînî:

Ez tune bûm, tu tune bûyî, ew tune bû.

gelejmar

Em, hûn, ew hebûn.

Em, hûn, ew tune bûn.

Jêder :

1. Çerkes Xûdoyêvîç Bakayêv, Yêzîkî kûrdov SSSR, Îsda. Naûka, Moskva, 1973.
2. Emir Djeladet Bedirkhan und Roger Lescot, Kurdische Grammatik, Bonn 1986.
3. Kamran Bedir -Xan, Rêzana zimanê kurdî, Parîs 1971.
4. K. K. Kûrdoyêv, Grammatika kûrdskovo Yêzîka na matêryalê diyalêktov kurmancî î soaranî, Îsda. Naûka, Moskva, 1978.
5. Qanatê Kurdo, Gramera zmanê kurdî, Kurmanc-soranî, Weşanên Roja Nû, 1990.
6. Sadiq Behadîn Amêdî, Rêzmana kurdî, kurmanciya jorî û jêriya hevberkirî, Bexda 1987.
7. Î. Î. Tsûkêrman, oçêrkî kûrdskoy gramatîkî, Moskva, 1962.

Dûmahîk di hejmeta tê de ye.

Li tenişt dîwarê goristanê (Çêrok)

Keça Kurd

Şevek bû ji şevên Qamişlokê; ronahiya birûskên ewran û çirîskên ji berên tivingan dirijan, laşê tariyê diqelaştin. Fîzêna fişekan di devê bayê de, awazine bi tirs û sehwa didêran; sînfoniya mirinê ji xelkên bêçare re pêktanîn. Min jî di devê direndeyê wê tirsê de, di

bin berbanka malekê de û li kuncika navbera du dîwaran de, xwe bi ser hev de guvaşti bû; min bi vî awayî xwe ji lehiya beran di parast.

Min di wê rewş û pîrgala xwe a bêçare de, weke zarokeke sê, çar salî, bîr li hembêza dayika xwe û germiya dilovaniya wê kir. Lê zû-zû min ageh li xwe bû, ku ez ne ew zaroka piçûk im, da ku xwe di hembêza diya xwe de biparêzim. Mixabin, dibe ku qedera min be; bi wî rengê ku diya min ez xwedî kiri bûm, bi xurtî li min kar kiri bû; kesayetiya min hinekî lawaz kiri bû. Min gelek caran hewl dida, ku ez xwe ji van lawaziyên nazikî û delalî rizgar kim û min hinek ji wan kêmahiyên xwe çareser jî kiri bûn, li gel wê jî hinek ji şûnmayên wê kartêkirinê di xwîna min de cih girti bûn û di hin helwestan de bi min re dihatine xuya kirin.

Di mala me de ez û diya xwe bûn, bavê min çû bû dilovaniya xwedê; ez û diya min di nav pencên hejariyeke bêsinor de hişti bûn. Diya min, ew jî weke gelek ji jinên kurdan, li paş mirina bavê min mêr ne kiri bû; ciwaniya xwe li ser xwedîkirina min danî bû. Her karekî west û dijwar hebû, diya min kiri bû; bi xuhdana milê xwe ez mezin kirim û ez dame xwendin. Diya min gelek hej min fikir û hejêkirina wê çemekî li herk bû. Ez ji wê re bûbûme nexweşî, şev û roj di gumana min de bû; man û nemana wê ez bûm. Diya min ji dû tiştan gelek ditirsa:

1-jî mirinê; paş mirina bavê min ku ji nişka ve rûda bû, tirsî mirinê hêlîna xwe di nav xwîna wê de çinî bû.

2-Jî girtîgehên Sûriyê, nemaze ji (liqê Felestîn) yê ku dewletê weha binav kiriye.

Diya min roj bi roj dengûbasên girtiyan û azara ku ji destê zebaniyan dikêşin, ji devê dost û hevalan digirt û ji min re dixwendin. Hun bawer

dikin ku ew hemî nemiroviya ku di nav dîwarên girtîgehan de rû dida, diya min ji min re digot; herwekî çawe li nav hemî civatên malan dihate gotin. Tiştêkî dî jî kar tê kiri bû, ew jî girtina kurê xalê min bû, ez hingê zarok bûm, digot; Neynokên wî hilkiri bûn û di nav cilên wî ên hemî xwîn de, ji diya wî re rêkiri bûn. Digot carekê jî di hewşa girtîgeha Qamişloyê de, ew serberjêr hilawisti bûn û xalê te birine wir, da kurê xwe di wê pîrgala nemirovî, ser û guh lê tev bi xwîn de bibîne. Lê xalê te weke çelengan, bêtirs ji wan re got: Eger we kurê min kuşt, xortên kurd hemî dibine kurên min.

Ji ber wan hemî çîrokên ku wê ji malbata xwe û ji xelkên dî jî bihisti bûn, tim hewl dida ku ez ji rêzanî û partiyên kurdî dûr kevim. Min jî, ne dixwest, ku ez dilê wê bişikînim û tim di tîrsa xwe de wê bihêlim, ez derengî şevê li der ve ne dimam. Eger şevêkê li cihekî dereng bimama jî, wê di serê min de gelek porpor dikir. Vêce ji bo ku ez xwe ji pit- pita wê biparêzim, bihtirên şevan ez hîn zû, ji berî demjimêr yazdeh li mal bûm. Lê vê carê û ji ber tivingên Tirkan ez neçar bûm, ta derengî şevê, li derveyî malê bimînim. Ê ez di wê tîrsê de jî bûm, ku ji diya min nedûr e, eger ew di nav bablîsoka fişekên tirkan de bi şûn min de bigere.

Paş ku badeva fişekan û kewte-kewta seyên Mehmeqeya rawesta, ez jî bi laşekî bêhêz û bi lîrêz, weke yekî diz min xwe ji wê kunca tarî şêland û ez ketime ser riya xwe, kolanek dido min birîn, ez gihame nav heriyê; kolan bêqîr bû, pîzrûkên baranê dihatin, şevereş bû..Min nêzîkî li goristanê kir, tariyê li ser singa wê konê xwe vegirti bû. Min li dora xwe nêrî, sehwe ez girtim, herçende ku ew rê riya min a her şev jî bû, lê ez nizanim, derengiya şevê bû an gelo wê sînfoniya mirinê ya dengê tiving û birûskan, ez di nav awazên tîrsê de guvaştî bûm? Çepçepa piyên min jî di nav heriyê de, bêdengî didirand...Ev sedemên ha, li gel awra min ku li rizda goristanê ket, derûnê min raheja; li gel ku gorek bi tenê jî ji min ve ne xuya bû, lê sehweke giran ez girtim, tevzînok bi laşê min de çûn, qeremên min lerizîn, di cihê xwe de ez rawestam. Min gelekî li ber xwe da, min hêz dane xwe; ji min re gelek şerm e, ez ne piçûkim, ez ji çi dîtirsim, ji miriyan!?

Ez di wê helwesta xwe de bûm û min nav li xwe dida; ez divê weha bim û nabê bi tîrsim; ji nişka de asman bû du parçe; li pêşiya min ronahiyê veda, birûskêkê lêda, erd di bin lingên min de zivîrî. Bi ronahiya birûskê

re, dîtina min dît, miriyek tevî kefenê xwe ê sipî jipê rawesta ye û bi nihêrîna min re, weha min zanî ku bi rexê min ve xwe çend kir û ber bi min ve hat. Ez ji lebtê ketim û di cihê xwe de hişk bûm, nikarim gavekê li pêş û ne li paş bidim. Ziman di devê min de şikest, lal bûm; zeq min li semta wî nêrî. Gava birûsk ji min bihurî, tarî li cihê xwe zivirî, belbelîsik li ber çavên min çêbûn, bi ser hişê xwe ve hatim, temaşê dikim, ku mirovek li ber dîwarê goristanê rawestayê; di rastî de reşek bû, min li destpêkê nezanî ew çiyê; mirov e, jin e an jî mêr e, li ber çavên min nexuya bû. Min di nav tariyê de çavên xwe hûr kirin û min awra xwe tûj kir. Min dît ku mirovek ber bi min ve têt. Çend gav avêtin, lê birêveçûna wî ne sasikar bû; serê wî bi pêş ve nivz bû, bi ser zikê xwe de xûz bû bû. Rûnişt û destekî xwe bi aliyê min ve dirêj kir. Ez hîn ji nav tora tîrsa xwe derneketi bûm; min degelî nekir yekser berpê biçim. Û ez hinekî pêjinîm û paşê min zanî ku ew mirovek e û alîkariyê ji min dixwaze. Min jî nemerdî ne kir, ez ber bi wî ve çûm, li ber sekinîm û min jê pirsî :

Mamo tu kîyî, çi bi serê te hatiye? Serê xwe bilind kir, ser xwe re li min nêrî. Di nihêrtina wî re, min dît, weke ku ji deh salan ve em hev nas dikin û min zanî ku ew Kurd e; ji ber ku gelek caran weha rû dabû, di pey gulebaranê re, birîndarin, an jî çend bazdayî xwe pelû malan dikirin; ji ber zordariya Tirkan mirovên rêzanî û xebatkerên Kurd baz didan. Lê Cendirmeyên Tirkan di sînor de, ew gulebaran dikirin.

Di bin kartêkirina hestekî mirovayetî de, min destê alîkariyê jê re dirêj kir û bi lez li pişt wî bl qelevîzka rûniştim, min destên xwe kirin bin çengên wî de, bi zimanê makî min jê re got: Arîkariya min bike ezê te rakim. Keserk dirêj veda û paşê got: Birazî, ji min vebe, ez nikarim ji vir bilebitim. Min got, ezê te bigehênim mal, da ez dextorekî binim ser te. Got, birazî ez çûme, textor nikarin miriyan sax kin. Di bere jî pišta xwe rast kir û cihê xwe di nav heriyê de xweş dikir.

Komek kevir û sêlak ji sê salan ve li wê deverê bû, li ser gotina ku şarevaniya bajêr wê kolana goristanê qîr bike. Ji lewra jî min çavên xwe li vî alî, li wî alî gerandin, li rexê rastê ew koma sêlakê ber çavên min ket; ji me ne dûr bû. Min destên xwe careke dî kirin bin çengên wî de û pişt- piştî ez çûm û min ew bi xwe re xirxirand. Mirovekî li ser xwe bû û bi gewde bû; bi dijwarî min ew gihande ser wê sêlakê û min pala wî da

komê. Wî jî pišta xwe rast kir û di nav sêlakê de xwe dirêj kir û ji min re got, cihê min weha gelekî baş e. Min dîse jê re dubare kir, ku ez bikarim wî bigehênim malê û ez textorekî bînime ser. Di lebta wî de xuya bû, ku ji xwe bê hêvî bû ye; ji lewra daxwaza min pişt guhê xwe diavêt û cihê xwe di nav sêlakê de xweş dikir.

Li tenişt wî li ser kevirekî ez rûniştim. Baranê jî vekiri bû. Destê xwe raberî min kir. Min jî bi lez bi herdu destan, mista wî girt û bi hejêkirin min ew guvaşt. Hêstirên min di ser gurmikên min re herikîn. Li min nêrî û got, birazî tu kurdî? Min got, belê ez Kurdim; ne tirse, ezê te di çavên xwe de veşêrim. Got, ma ezê ji çi bi tirsim!? Birazî, gava mirî dimire û serê wî li hedan dikeve ji nû ageh li xwe dibe...Keserek ji kangeha dilê xwe kişand. Xwe bi ser hev de guvaşt. Min zanî ku ew pir diêşe, lê wî azariya canê xwe dadiqurtand, herwekî çawe xwîna di devê xwe de jî dadiqurtand. Hinekî bêdeng bû, çarnikarê xwe nihêrî; weke yekî bêje ku ev nihêrtina dawî ye. Paşê awra xwe di nav zevî de tûj kir û jê ne birî. Di axivî lê gotin di devê wî de diqurmiçîn û min nekarî li gotinên wî ên dawî bigehim.

Destên wî di nav destên min de sist bûn, neliv ket û can sipart. Çavên wî bel mabûn û awra wî ji zevî neşikest. Min di awra wî re, canpakiya wî û pileya girêdana wî bi erda bav û bapîran re nas kir; ji lewra jî min destên xwe li ser singa xwe danîn û min ji wî canpakî re serê xwe nivz kir..

Hîn ez di wê pîrgala xwe a rêzlêgirtina ji bo wî şehîdê wînda de bûm ku rekeha singa min li dilê min dihate hev; reşê kêra vî gelê bêçarenûs weke marekî xwe li gerdena min dipêça û min ageh li hawîra xwe jî ne bû, hew min dît ku cîba parastin li ber min sekinî, bê pirs û bersiv destên min bi pişt min ve dawerxelandin û hişk bi bendên hesinî girê dan. Ez avêtim nava terembêlê, bi quntaxên tivingan û bi pehînan ez dehf dame paşiya cîbê...

Ez ne siyasî bûm û min di ti partiyan de jî kar nedikir, lê dijminan bi darê zorê kirasekî siyasî li min kirin û ez pê gunehkar kirim; di nava wî kirasî de hestiyên min şikandin û pišta min xûz kirin..Ez ji girtîgehê ne berdîdam ta ku tîra jehirdar, ya vê kêra min singa diya min birî, dilê wê veçirî.. û diya min buxçika derdû kulên xwe di nav hestên xwe ên xwînawî de pêçan û bi laşekî birîndar ve serê xwe danî; di goristana Qudûrbegê de, li rex bavê min nivist, nivistina bêdawî...

Bêdengiya qizêzê



Di bêdengiya qizêzê de
dîmenê min qeşa girtiye
tenhatiya min li destpêka zivistanan xwe dipêçe
û di riswebûnê de diqerimim

Dibim keldûman
di sînorên qijiliyê de diherikim

Pelçiman datînim ser birînên xwe
û xwe diguvêşim lorandinê
tenê wênayên şewatê didim hev
û di bîrana xwe de hiltînim

Ziyan .. min davêje keseran
Keser .. ji berikên min diweşin gunehkariyê
Gunehkarî .. ji çavên min dadirive tevizandinê
Tevizandin .. hemî habûna min dorpêç dike

Nezîr Palo

Kenê min .. bê gewde dimîne
gewdeyê min .. ji sîbera xwe direve
sîbera min .. di bin laşê aramiyê de digrî

giriye min .. di helbestekê de bê reng dimîne
û helbesta min .. navekî ji xwe re nabîne

Bajarek .. navê min dicû
bajarek .. biyaniya min gezdike
bajarek .. esîdê bi ser canê min de direşîne
bajarek .. kufikê dixê çavên min
û bajarê min .. oksicênê li ser min kilît dixe

Ez bi avê têm şikestin
ax .. min dixe pirseke pûç
ba .. giliyekî di hulma min de vedike
ronahî .. hemî rûpelê min yeko yeko dihêre

Ez bînerê ketina xwe me
rondikên min .. şîndariyekê di temenê min de nîgar
dikin
jiyana min lîsikeke pejmûrdeyî ye
ji her aliyekî ve têm sotin

westayî diweşim valahiyê
pença xwe li ser matmayînê didim hev
her rojê deziyekî ji kefenê xwe re dihûnim
û neqşeyeke bê wate dirêsim



Ez bişewtim jî...
dûmanê min dê ji te hezbike!



*"Ji dildariya te re...
Piştî vêketina Newrozê*

Bibore...
Şevê...!
Bîrêkirinê...
Di mêtina tariyê de,
ez xilmaşi geza te kirim,
mîna hetaveke di tariyê re direve,
bi destên min girtin û
Pergende
li ber deriyê te danîm û got in:
Hezperesto de nimêjke !
pencere dê bîhn bidin û
Ronahî bi ser seqemê bikeve .
Wêneya te jî,
bi ber leylanê diket,
gupikên bi daran ve
bi lêvên te xemilîn.

Strana Şawiyê ji te re bû.
Sermestiya Şevê...
Awazên hêviyê...
Ji te re bûn

Hêmin Kurdaxî

Hê...viya şiliya min!

.....

.....

Bibore...

Min destên te guvaştin.

Bibore...

Min stranên eşqê jî
diyarî te kirin.

.....

Min tu dît,

xewna xwe a ku min têde

memikên te dimêtin,

hat bîra min

xewna ku min têde

germahiya tena te himbêz kiri bû

hat bîra min.

Bibore... !

Wê şevê ez dihêêêwirîm ser masa te,

ez serxwe...ş bûm û

min ji te re got:

“Wek xwe be

li ciyê xwe be ,

buhar dereng namîne

gula ber porê te

dê bifire“.

Keskesora dilê min jî, birîndar bû

dildara min...!!! .

Bibore...!

Dema min ji te hez kir.

Rojek wek hemû rojan bû,

pêlek wek hemû pêlan bû,

wek wa salnameya bi dar ve,
rojên xwe berê jîmartî bûn.
Lê kaxeta di destê te de,
soza helbestek hîn ez li bendê bûm,
tevî wê jî
min qet ji xwe nepirsî:
Ka ezê ji evîna te çî werbigrim?
Yan ezê çî bidim der?
Min qet ji xwe nepirsî:
Tenê min zanî ez nawestim,
bahozek xort û zer hat
û min
bi dilê xwe biryar lê da.
û
kaxez ji dest te girt.

Bibore...!
Zeriya min dixwazim te
tevlî bajêr himbêz bikim.

Bila diwarên bajêr
bi ser xewnên me ên şikestî de biherifin !
De were !
Ne ez dikarim,
Şewata giran,
bi çirkandina diranan vemrînim.
Ne jî ez dikarim bîrêkirina xwe,
tevlî leylanên koçberan bikim.
Te lêvên xwe jî xewna min jî revandin.
Dildara min !
Lê îro ji min ne revîne !
Rojek newroz e!!
Xweziya sal tev Newroz bana,

û hertim tu li ba min bûya.
De were, were !
Tu her sal bê nav were!
Ez dê navekî li te bikim,
wek herikîna çem
di xwîna min de serbest bibiştirkuve!
Berve agirê te,
Xwîna ji bîr kirî,
navê buharê dikolîne .

.....

.....

Dengekî xerîb û nenas dihat,
digot:
min birûskên xwe,
di çolistana bejna te de wenda kirine.
Bihêlin em û destên ku hîn
em hev nasnakin,
bi hev re bilîzin.
Toza te,
toza dema te...,
ber kîjan bayê reş ketî,
dilopên brûskên te,
bi ser kîjan zengê ve dinuqutin?
Bila bi ber bayê te kevin ev bajar!
Bila bihelin ev bajar!
Berî Bahoza min wan dide ber xwe,
berî av min ... wan vedixwe,
birûsk xilmaş in,
nîşan bi mij in,
ew siwarên hetaveke nexweş in!!

Ax... !
"Ez lawê pêkên xwe me,
stêrk jî wek min in.
Em ji bédengiyê bêpar in"
Dilê min...!
Mîna koka darek hişkbûyî,
tenê rûyê wê li şewatê ye.
Lê...,
bi komirê jî carna
buharek reş tê nivîsîn.

Reng...
Ji sala keskesorê û min ve,
bi bedena xwe ve,
bi dar ketine.
.....
.....
Di paş hilatin û dahatina sîngê te de,
di paş wê kenê te de,
di asîmanê rûyê te de,
û firîna çavên te de,
mizgîniya firîneke germ heye.
De wer e !
em bi baskên hev bifirin,
ta ez bişewtim jî
dildara min
dûmanê hestên min dê ji te hez bike.

20. 04. 2005 - Almaniya

Newroz pîroz be



Beşê Erebî.....